Kurdisch

MiMi Gewaltprävention
Mit Migranten
für Migranten

Parastina tund û tûjiyê li Elmaniya

Rehbera ji bo koçber û penaberên nû yên mêr

Bi alikariya:

Die Beauftragte der Bundesregierung
für Migration, Flüchtlinge und
Integration

Ethno-
Medizinisches
Zentrum e.V.

Impressum

Gewaltschutz in Deutschland – Ratgeber für geflüchtete und neuzugewanderte Männer

Herausgeber:
Ethno-Medizinisches Zentrum e. V.
Königstraße 6, 30175 Hannover

Konzeption, Inhalt, Erstellung:
Duale Hochschule Baden-Württemberg Villingen-Schwenningen (DHBW)
– Institut für Transkulturelle Gesundheitsforschung
Ethno-Medizinisches Zentrum e. V. (EMZ e. V.)
– MiMi Integrationslabor Berlin (MiMi Lab)

Förderung: Beauftragte der Bundesregierung für Migration, Flüchtlinge und Integration

Projektleitung: Ramazan Salman (EMZ e. V.), Prof. Dr. Dr. Jan Ilhan Kizilhan (DHBW)

Redaktion: Prof. Dr. Dr. Jan Ilhan Kizilhan, Claudia Klett, Ahmet Kimil, Laura Przybyla, Anne Rosenberg, Ramazan Salman, Andreas Sauter, Silvio Schelle

Layout und Satz: eindruck.net

Übersetzung: Dolmetscherdienst – Ethno-Medizinisches Zentrum e. V.

Bildquellen: Umschlagbild iStock.com/BijoyVerghese
Seite 2: iStock.com/IG_Royal · Seite 8: iStock.com/KatarzynaBialasiewicz
Seite 15: iStock.com/lathuric · Seite 18: iStock.com/tomozina
Seite 27: iStock.com/nanmulti · Seite 30: iStock.com/BrianAJackson

Alle Rechte vorbehalten. Das Werk ist urheberrechtlich geschützt. Jede Verwendung in anderen als den gesetzlich zugelassenen Fällen bedarf deshalb der vorherigen schriftlichen Genehmigung durch den Herausgeber.

Diese Publikation können Sie jederzeit über die Webseiten „www.mimi-gegen-gewalt.de“ oder „www.mimi-bestellportal.de“ in folgenden Sprachen anfordern: Deutsch, Albanisch, Arabisch, Bulgarisch, Dari, Englisch, Farsi, Französisch, Kurdisch (Kurmanci), Paschto, Russisch, Serbisch/Kroatisch/Bosnisch, Türkisch

1. Auflage · Stand: November 2018

Bixêrhatin

© Bundesregierung/Kugler

Xwendevan ên xweş,

Her mirovek mafê wî heye çarenivîsa xwe destnîşan bike û bi azadî û bê tirs ji tun û tûjiyê bijî. Li seranserî Elmaniya projektê „MiMi – pêşîlêgirtina li tund û tûjiyê bi penberan re ji bo penaberan", ku vê rehberê diweşîne, xwe bi vî karê xwe bi hêz dike.

Ev rehber mêran yên paşmaya dîroka wan penaberî ye, bi hêz dike, da bikari bin wek navber (Mediyator) li dor yasa û rêmayên me di pêkvejiyanê de pêzanînan werbigirin û roleke çalak û aktîv ji di pêşîlêgirtina li tund û tûjiyê bilîzin. Karê mirov ên navber gelekî giring e, Ji ber her yek penaber bûbe û berê xwe bide Elmaniya, rû bi rû yî hinek dijwariyan dibe: Ev nehêsan e, ku hatina li welatekî nû de, mirov rêya xwe bibîne û rêma û irf û adetên wî welatê ew bi xwe girtî ye, nû hatiyê de tê bigihe. Gelek tişt ji nêrîna pêşîn ne normal diyar dibin û hin nayêne têgehiştin. Eve ew cih e, ku navbir tên, rêma û yasayan zelal dikin û şêweyê piştgirî-û alîkariyê pêşkêş dikin. Navbir ji serboriyên xwe dizanin, ka çawa mirov dikare jîngeheke baş di jîngeheke nenas de ava bike. Bi taybetî dema serpêhatiyên traumayê bi ser de werin. Ew bi wî karê xwe, xizmeteke bê hempa, ku tiştek cihê wê ji mirovekî nû hatiye elmaniya re û jiyaneke xweş bi ser de bibe, nagire.

Ev rehbera li pêşberî hewe pirs ên zor giring dike, daku tund û tûjî bi kar neyêt. Di van rûpelên bihên de, yasayên bingehîn û yasayên taybet ji bo parastina ji tund û tûjiyê û diyarkirina rêkên çareseriyê ji wê tund û tûjiyê têne diyarkirin. Ev rehber ji bo xatirê penaber û koçberên mêr e yên nû û her weha hemî ew mirov ên têkildar bi pêşlêgirtina li tund û tûjiyê ne û karkirin bi wan re ji bo jiyaneke bê tund û tûjî û pêkvejiyaneke bi aştiyane li welatê Elmaniya.

Di gel silav ên ji dil

Annette Widmann-Mauz,
wezîra dewletê li ba rawêjkara Elmaniya û erkpêdera hukumeta federalî ji bo penaber, koçber û pêk ve jiyanê

Naverok

Danasîn 4

1. Tund û tûjî çi ye? 6

Çi formên tund û tûjiyê di nav bera microvan de hene? | Ev tund û tûjiya di nav bera mirovan de, li kû li dar dikeve? | Çi encamên tund û tûjiyê bo yên têkildar hene? | Encam bo zaroka

2. Kengî mirov dikare navê tund û tûjiyê li bizavekê bike? 14

Nirx û pîvanên mîna rastdariya bo tund û tûjiyê | Guherîna nêrînan beramber bi tund û tûjiyê | Çi wateya nirx û irf û adetan di penaberiyê de heye? | Rêmayên yasayî û zagonên li Elmaniya | Desteseriya dewletê li ser tund û tûjiya li Elmaniya

3. Çima Tund û tûjî heye? 24

Çarçoveya mercên civakî- Tund û tûjî û desthilat | Çi raman in yên tund û tûjiyê rastdar dikin | Tund û tûjiya kultûrî û olî | Kultûra tund û tûjiyê | Sedemên derûnî ji bo serederiyên tundrew | Ecamên ji bo yê tewanbar- mirovên, tund û tûjiyê dikin, nexweş in?

4. Rêkên ji tund û tûjiyê diçin 32

Ez dikarim çi li dijî tund û tûjiyê bikin? | Li kû dikarim alîkariyê bikim? | Delîveyên şêwirmendiyê | Terapiya derûnî | Kursên ji bo perwerdehiyeke bê tund û tûjiyê

Ferhengoka têgehan 36

Adrêsên têkiliyan yên bijarte 40

Danasîn

Ev rehber ji kê re ye?

Tund û tûjî li gelek welatan li ser vê zemînê heye, lê bi şêwe û di reweşên cuda de û bi rêjeyeke cuda. Delîve û serederî bo parastina ji tund û tûjiyê jî, ji welatekî bo welatekî din cuda ye. Ev rehbera hanê dixwaze alîkariyê di warê, ku serwextbûna pirsên ji bo mijara tund û tûjiyê li Elmaniya hêsanîtir bibin. Ev rehber dixwaze li dor parastin- û delîveyên pişgiriyê pêzanînan bide we, her wisa pêzanînan li dor dan delîveyan bo naskirina serederiyên tund û tûjiyê li ba xwe û li ba yên din, ji bo xweparstin û kêmkirinê. Ev rehber bo wan e, yên mijarê balkêş dibînin, yên hin mirovan nas dikin, ku kartêkirin der encama tund û tûjiyê li wan peyda dibin, wek qurbanî an jî tewanbar, an jî yên kar dikin bi rêzgirtineke hêja kar bikin. Bi taybet, ev di be babeta yên bi rêzgirtin serederiyê di gel hevjînên xwe û malbata xwe dikin.

Ev rehber, bi taybetî berê xwe dide koçber û wan mêrên wek penaber yên nûhatî.

Mêr û jin bi şêwaz û pîvanên cuda cuda tûşî tund û tûjiyê dibin û ew bi xwe jî tund û tûjiyê cuda cuda bi kar tînin. Serederiya di gel serpêhatiyên tund û tûjiyê û encaman jî ji hev ferq in, ji ber wê jî

Pêzanînên bo mêran û jinan giring in. Ji bo jinên penaber û nû koçber bûyîn rehbereke wan î taybet heye.

Di vê rehberê de, rewşa wan penaber û koçberên nûhatî, yên li welatên din an *civakên* din mezin bûne, li ber çavan têne danînê,

li wir şêwaz û pîvanên tund û tûjiyê, belê têgehiştina tund û tûjiyê jî di nav hevjîniyê de û li nav malbatê û serederiya wan di gel, daku ew ciyawaziya bi hêz, di nav wan deveran û tiştên hatî wergirtin li Elmaniya ji hev diyar bibin.

Naveroka vê rehberê çi ye?

Beriya li dor ka çawa pêdiviye mirov xwe ji tund û tûjiyê biparêze were axaftinê, divêt bizanin ka tund û tûjî tête çi wateyê. Naveroka beşê 1. Tund û tûjî dikare di form û pîvanên xwe de cuda bin. Hindek vewejirandin dikarin alîkar bin, ka çi tund û tûjiyê ve bend e. Tund û tûjî jî encamên cuda cuda li ser yên têkildar hene. Ji bo parastina ji tund û tûjiyê û alîkariyê li dema serederiya di gel tund û tûjiyê giring e, wan encamên, ku mumkine diyar bibin, bizanin. Zor caran ew nerehetiyên saxlemiyê di pey tund û tûjiyê re dibin, li ber çav nayên girtin. Ji bilî wê, encam diyar dikin, ka çendî giring rê li ber tund û tûjiyê were girtin.

Di beşê 2, behsa wê hindê dike, dema ku bi karanîna tund û tûjiyê dikare rastdar bibe, bo nimûne, dema pêdiviye mirov bihêne parastin. Li dema tund û tûjî rêpêdayî be û wek neheqî, ji welatekî bo yê din cuda ye. Ev bi nirxên wê civatê ve girêdayî ne, her weha bi şêwe û yasayên wê civatê ve jî bend in. Her wisa jî ji mirovekî bo yê din dikare ciyawazî hebe, ka tund û tûjî çawa tê dîtin û çi weke serederiye normal tête pejirandin. Ji bo parastina ji tund û tûjiyê, nêrîn û dîtinên yên pêwendîdar û yên civaka mirov tê de dijî jî giring e mirov nas bike. Zêdebarî û pê ve girêdayî wê çendê jî wan hemî rêma û yasayan.

Ji bo em baş tê bigihim, ka ji bo çi ev tund û tûjî di nav mirovên civakê de çê dibe, çarçeweya şert û mercên civakî û parvekirina desthilatê di civakê de binihêrin û nas bikin. Ev babet di beşê 3yan de diyar dibe. Li ba her mirovekî mandîbûna derûnî û nexweşiyên derûnî dikarin sedemên bi karanîna tund û tûjiyeke giran bibin. Her yek li gor sedem û çarçoveya şert û mercan pêdivî bi serederiyên cuda cuda hene, daku rêjeya tund û tûjiyê kêmtir le were.

Di beşê4an de, şirove dike, ka yê têkildar dikare berê xwe bidin kî deverê, eger qurbanî an tûşî tund û tûjiyê bûbin. Navendên têkiliyên bo wan kesên tund û tûjiyê dikin û dixwazin bi dawî bînin, diyar dibin.

1. Tund û tûjî çi ye?

Tund û tûjî metirsiya li ser tendurustiyê û carnan jî metirsî li ser jiyana mirovan heye. Ji ber wê jî rêxistina tendurustiya cîhanî (WHO) xwe pê ve mijûl dike. Ew tund û tûjiyê di „raporta cîhanî ya tund û tûjî û tendurustî" ji sala 2003an destnîşan dike wek:

„Bi karanîna tund û tûjiyê bi şêweyekî bi mebest an bi karanîna rastî ya hêza laş an desthilatdariya *fîzîkî li dijî kesayetiya xwe an mirovekî din, dijî komekê an jî civakê, ya konkrêt an bi rêjeyeke herî bilind bibe sedema birîndarkirin, mirin, ziyanên derûnî, mezinbûneke bi şaşî an *bêbeşkirinê.*"**

Naveroka tund û tûjiyê

- serederiyên ziyandar, ku mirovek li dijî xwe bi xwe bi kar bîne (bo nimûne xwe birîndar bike an xwe bikuje)
- Tundûtûjiya ji hêla mirovekî an gelek mirovan bi kar were (bo nimûne serederiyek xerab li malbatê, êrîş di rêka xerîbekî an di dibistanan de an li cihê kar)
- Bi karanîna tund û tûjiyê di rêka grûpeke mezin de wek Welat, *milîsan* an grûpên terorê, bo cihbichkirina armancên siyasî, aborî an berjewendiyên civakî (bo nimûne şerê bi çekan, qirkirina gelan, binpêkirina mafê mirovan an jî terorîzim)

Çarçeweya serederiya di gel tund û tûjiyê li gor rêxistina cîhanî ya tendurustiyê ne tenê, birînên laşî ne, lê belê gefxwarinên devkî û tirsandin e jî. Tişta hevbeş di nav bera hemî serederiyên tund û tûjiyê de, ku encamên hemiyan ziyandar in an dikarin ji bo tendurustiya laşî û giyanî ya mirovekî an gelek mirovan bibe heta bi sedema mirinê.

Îro jî, di eynî demê de wateya tund û tûjiyê, bi gişti „sinordarkirina pêkanîna zatê xwe" ya mirovekî tête têgihiştin. Tê wateya, ku mirovek di qerardana xwe de, ka çawa dixwaze jiyana xwe bi rê ve bibe, sinordarkirî ye. Ev dikare di rêka mirovan re, lê di rêka hinek rêmayên destnîşankirî in saziyan an jî navendan an di rêka têkiliyên hêzên neheq re di civakê de were encam dan. Ji bo parastina demdirêj ji tund û tûjiyê pêdiviye jî têkiliyên civakî li ber çavan bêne girtin.

Di vê rehberê de li pey vê re dema Tund û tûjî di nav mirovan de rû bide, wisa dema Tund û tûjî ji hêla mirovekî an gelek mirovên din re bi kar were.

** Ferhengoka têgehan ew in hin xweher di deqî de werin pêşber*

ÇI FORMÊN TUNDÛTÛJIYA NAV MIROVAN DE HENE?

Tund û tûjiya di navbera mirovan de dikare bi şêweyên cuda be:

- **Tund û tûjiya laşî („fîzîkî“)**
  Bo nimûne: lêdan, pihîn, êrîşa bi her çi tişt be, porkişandin, şeqamlêxistin, dehevdan, destxistina qirikê, hejandin, şewitandin
- **Tund û tûjiya („derûnî“) giyanî**
  Bo nimûne: pîskirin, herdem rastkirin, xeberçorgotin, kêmkirin, pêkenîn (bi gelemperî jî), êxistina bin fişarê, gefxwarin (bo nimûne mirov tiştekî bi xwe an bi zarokekî bike an zarokan bibe)
- **Tund û tûjiya cinsî**
  Bo nimûne: li dijî hez û viyana yê din mecbûrî karê cinsî bike, tecawizkirin, kirina qehpîtiyê bi darê zorê an wênekişandin/girtina filîm li dema karê cinsî.

Bi taybetî di beşên pirîvat de zêdebarî wê ev formên tund û tûjiyê hene:

- **Tund û tûjiya civakî**
  Bo nimûne: kontrola berdewam, qedexekirina têkiliyan, qedexekirin ji bo çûna kursekî zimanî, qedexekirina derketina ji malê, mecbûrkirina bi rabûna kiriyarên li dijî tîtal û nirxan.
- **Tund û tûjiya mewdanî**
  Bo nimûne: bi xwe ve girêdana mewdanî, qedexekirina karkirinê an xwendineke pîşeyî, destdanîn û kontrolkirina pereyan bi tena xwe

TUND Û TÛJIYA DI NAV MIROVAN DE LI KÛ LI DAR DIKEVE?

Tund û tûjiya di nav mirovan de, dikare li cihên cuda cuda û bi sedemên cuda cuda li dar bikeve:

- **Di cihên giştî de de**
  Bo nimûne di busa an di tramê de, li dîsko
- **Li navendan**
  Bo nimûne li xaniyên hevbeş (Kamp), li komeleyan, li kar an li dibistanê
- **Di beş ên pirîvat de**
  Bo nimûne di rêya endamên malbatê de, xizm û hevalan
- Eger tund û tûjî di nav hevjînan de an yên berê hevjînên hev de bi kar were, êdî em dikarin navê **„Tund û tûjiya nava malê“** lê bikin. Li vir yên têkildar bêhtir jin in.

Li Elmaniya her yek ji 4an jin di jiyana xwe de dibe qurbana tund û tûjiyê, ya di rêka hevjîn an kevne-hevjînî ve li dar dikeve.

Delîveyên xweparastinê ji cihekî bo yê din cuda ye. Eger têkiliyek an pêvegirêdanek di gel mirovekî de hebe, ku tund û tûjiyê bi kar tîne, bo nimûne mamoste, berpirs an di nav malbatê de, zore mirov bikari be xwe ji tund û tûjiyê biparêze, bêhtir ji mirovekî ku nenas be.

Zêdebarî wê hindê encamên tund û tûjiyê girantir in ji bo mirovên têkildar. Bi taybetî encamên tund û tûjiyê girantir dibin, li nava Malbatê, ji ber ev di cihên taybet de dibin, ku xwedê girevî pêdivî bû bibin cihên parastinê. Li vir Tund û tûjî ji mirovên herî nêzîk der dikeve, ku bi giştî diviya bû bûba cihê piştgirî û parastinê.

Hijmara mezin di van kewdanan de yên tundûtûjiya nav malê dikin ew mêr in û jin yên qurban in. Berdewam zarok bi xwe têkildar dibin.

ÇI ENCAMÊN TUND Û TÛJIYÊ BO TÊKILDARAN HENE

Encamên tund û tûjiyê dikarin ji bo têkildaran cuda cuda bin. Ji hêlekê ve, yên Tund û tûjî li wan dibe ciyawaz in. Li hêla din her mirovekî bertekê ciyawaz nîşan dide. Ew jî vedigere wê hindê, ka ew mirovê têkildar çendî piştgiriyê ji malbata xwe, hevalên xwe an ji mirovên din werdigire.

Eger ew mirovê tund û tûjî lê dibe bikari be di gel mirovekî li dor baxive û piştgiriyê werbigire, bo nimûne bi hevpişkê an jî hevpişka jiyana xwe an di gel hevala xwe, hevalê xwe, baxive, êdî dibe alîkar bo saxlembûnê.

Tund û tûjiya navmalê ne mijareke pirîvat e, belê yeke sezdar e

Kartêkirin û encamên tund û tûjiyê zorbeyî caran li beşên cuda di jiyana mirovî de hene. Hinek ji wan encaman tênê dîtin, yên din nayêne dîtin. Hinek encam yekser di pey bi karanîna tund û tûjiyê re diyar dibin, hinek ji wan bi heyvan an hîn dirêjtir rû didin. Caran zor zehmet dibe, ku mirov bizani be, ka encamên serpêhatiya tund û tûjiyê çawa ne.

Encam ji bo tendurustiyê

Bêhtirîn ziyanên laşî ev in:

- Hestîşikestin, xerabûna di nav regezan de, xwînherikîn ya hundurîn, ziyana li mejî (wek encama lêdana li serî an ketin pey li hevketinê), birînên zû saxlem nabin, şûna birînê (bo nimûne di rêya vebirînê re, sotandinê, zel,itandin), kulbûn, kêmbûna dîtin- û bihîstinê
- Li dema destdirêjiya cinsî, wate mecbûrkirina rabûna bi karê cinsî, zêdebarî wê: birînên qûnê und xwînherikîn, azara berdewam li dema karê cinsî, pelqaz- û kulbûna gurçikan, nexweşiyên cinsî û yên vegirtinê, bêdundebûn, nema karîna rabûna bi karên cinsî (li nik keçikan û jinan jidayîkbûnên şaş dibin, nexwestina ducaniyê û kulbûna quzî û xwînherkîna bi ser de)

Hinek ji van birînên laşî û nexweşî dikarin tîmar û saxlem bibin. Ji bo wê xizmetiya nojdarî zor giring e.

Ew ziyanên tendurustiyê yên bi sedema tund û tûjiyê rû didin netenê laş têkildar dikin, belê giyan an *„derûn“* jî.

Zorbeyî encaman bo tendurustiya giyanî („derûnî“) evin:

- Xerabûna razanê, fikar (lihevketin an tirsa ji mirinê di rewşên nemetirsîdar de, tirsa bi cih hêlana xênî an jî odeyê), serêş, dilxelênek, guman lêkirina li beramberî mirovên biyanî, *xemnakî,* xemgîniyeke mezin û guman û şermînî û hest bi gunehbariyê, bîrahtinên tehl (dubare jiyabûna serpêhatiya tund û tûjiyê li nav mêjkî), bêhintengî û hêrsbûn, xermanê dermanê hoşbirê û dermanên din (b.n. dermanê serêşê), hest bi peydabûna hizra xwekuştinê an hewldana xwekuştinê

Bi tayabetî ev li tund û tûjiya cinsî bêhtirê caran çêdibe:

- Dilxelandina ji ber laşê xwe, qerfa ji karê cinsî, hezkirina zêde ji karê cinsî, windakirina hesta bi karê cinsî ta bi *qelsbûna* karê cinsî

Bi taybetî ew encamên giyanî, her dem girêdana wan bi serpêhatiyên tund û tûjiyê re tê, belê weke „kêmasiyekê“ an „bê hêzbûnekê“ dihête nirixandin. Ev dikare wî hestê bênirx bi hêz bike û tîmar û saxlemkirinê zor bike. Dikare wisa were, ku malbat an jî heval û hogir van bi hev ve girêdanan tê negehin û wê serederiyê rexne bikin an fişarê zêde bikin. Ev jî dikare saxlembûnê bi zehmet bike.

Wek gelek birînên laşî, ku tîmar û dermankirinên nojdarî û xizmetguzarî pêdivî bin, ku bikari bin saxlem bibin, wisa jî gelek birînên giyanî pêdivî dermankirin û xizmetguzariyê ne. Ji bo dermankirineke profîsiyonel ya birînên giyanî *terapeutên* jin û mêr yên derûnî û her weha bijîjkên jin û mêr yên derûnî têne dan bo xwendinê. Ev dikevin bin barê *razveşartinê/Sirveşartin* de. Ew tişta ku di gel we were axaftin, nabe bo kesekî din were veguhestin (beşê 4, Rêkên derketina ji tund û tûjiyê)

Encamên malbatî û civakê

Mirov weke bûnewerên civakî dibe têkiliyên wan î *civakê* hebin. Ev in bo nimûne malbata wan, heval û nas an hevalên karî.

Tund û tûjiya di nav mirovan de peyda dibe, bêhtir ji van mirovên di vê meydan civakî de dijîne. Kêm caran em dibînin yê tundrewkar li dijî yê têkildar, ji zeviyekî civakî din tê û ew encamên civakî xerab û mezin li şûn xwe dihêlin.

Sînordarkirina ji derdorên malbatê û civakê

Eger Tund û tûjî, bo nimûne di nav hevjîniyê de di rêka jihevcudabûnê de an berdanê de bibe sedema bi dawîbûnê, dikare zêdebarî wê di encamê de malbat nepejirîne. Ne her car yê xizim û kar piştgir in bo qurbaniyê tund û tûjiyê, bi taybetî dema ew jin bin. Di hinek rewşan de, yê tewanbar tête parastin, bi taybet dema mêr bin.

Eve li wê vedigere, ka kî ji van hevpişkan çi maf heye. Qurbaniyên tund û tûjiyê êdî zêde dikevin nav tenêtiyê de, hest bi gunehiyê dikin û di rewşa mewdanî de belengaz dibin. Ev alî ji dê û bavan an aliyê din ji hêla malbatê ve nayêne pejirandin, zarok jî êdî berdewam dikevin bin barê vê xemê de. Bi wê sedemê nasnameya aliyekî ji dê û bavan tête nepejirandin.

Hun dikarin wisa alîkar bin

Dibe hun mirovinan nas bikin, di malbatê de an hevalên derdora we, yên rewişta wan seyr e an rerwişta wan hati be guhertin. Dibe hun hin mirovan nas bikin, bêhinteng bin an zû tore dibin, an ji nişka ve têkiliya dibirrin û xwe vedikişînin. Dibe ev be, ku bi sedema tûşîbûna cureyên tund û tûjiyê ye. Li vir eger rewişt ne bi mebest lê were nerîn, dikare alîkar be, lê weke peyveke birîna giyanî be. Ew dikare alîkariyê bike, wê têkiliya di gel wî mirovî de biparêze an li têkiliyê bigerî, bêy ku ew bi nerehtiyê hest bike.

Kartêkirina li malbatê

Guvaşa civakî ji hêvîkirinan tê, ew yê malbatê an derdora wan ji ber bi rewiştên mirovekî ve girêdayî. Sedema hêvîkirinê gelek in, ji wan bi zayend ve girêdayî ye. Li ser van nêrînên destnîşankirî, ka ew mêr û ew jin (di heman demê de jî ew xort û ew keç) rewişta wî çawa ne, çi serederî rast e û çi şaş e. Ev nêrîn, ku pêdivî ye mêr çawa serederiyê bike, gelek caran hizir hene bi „hêzê", „parastevan" an „malxuyê malê" bend e.

Di hin rewşan de dibe sedema, ku xort an mêr di nav malbatê de mecbûr bibin tund û tûjiyê bi kar bînin, bo nimûne hizra parastina „şerefa" malbatekê.

Eger mêr bibin qurbanê tund û tûjiyê, êdî wisa dibe, ku ew wê hêvîkirina bi wan ve girêdayî nikarin pêk bînin, ji ber ew bi xwe pêdivî piştgiriyê û alîkiyê dibin. Ev dikare bibe sedema kêşeyan an bibe nepejirandin ji hêla malbatê an derdora wê ve ya civakî û ew jî dihêle yê têkildar bi xwe nepejirîne. Di eynî demê de jî yê dijberî bi xwe tûşî tund û tûjiyê dibe, hizra ku mêr „mêrekî bi hêz e". Bi taybetî li dema tund û tûjiya cinsî yê qurbanî zorbeyî caran hest bi şermeke mezin û gunehekî dike û ji ber wê jî nema dikare vê babetê bi mirovên pêbawer re jî baxive.

! Qurbaniyên tund û tûjiya cuda neke, ç mêr û çi jin, negunehbar û ne jî berpirsiyar in di ber tund û tûjiyê de, ya li dijî wan dibe.

Eger tund û tûjî demeke dirêj berdewam kir, dibe ku bibe sedemeke bêhtir ji vêkêşana ji jîngeha civakî. Bawerî bi ewlehiya xwe dihête windakirinê. Nirxên mirov î taybet tenê diguhertin.
Cîhan wek gefxwarinekê dihête dîtin. Zor dibe, ku mirov biçe kar bike.

Encamên metirsîdar yên malbatî û civakî dikarin wê kartêkirinê bikin, ku mirovên têkildar bixwaze encamên giran yên tund û tûjiyê, yên li tendurustiya wî bûne veşêrin an hîn jî tehemul bikin.

Alîkariya ji navendên şêwirmendiyê

Navendê şêwirdariyê ji bo qurbaniyên tund û tûjiyê alîkariyên profisiyonel pêşkêş dikin. Li wir dikarin li ser encaman bêne axaftin *pîvan* û delîveyên piştgiriyê bêne dîtin. Kesê têkildar ew e yê her dem bi xwe biryarê werdigire, ka çi cure alîkariyê bistîne û an dixwaze *gilî* li ba navendên polîsan bike an na. Di şêwirmendiyê de, çi ji serpêhatiyên wî an biryarên wî nayên na kirin, lê serederiyê di gel mirovê têkildar her dem bi rêzgirtin û têgehiştin tê kirin.

Li vir jî yasaya razveşartinê ji bo şêwirmendê an şêwirmenda nabe ew tişta hatî axaftin ji hin din re were veguhestin.

Ji bo tund û tûjiya di nav male de û tund û tûjiya cinsî gelek alîkarî bo pêşkêşkirinê hene û taybet bo jinên têkildar in, ji ber rêjeya herî bêhtir tûşî tund û tûjiya nav malê û tund û tûjiya cinsî dibin, jin in. Li gor herêmê hindek mêr jî hene ku tund û tûjî li wan tê û ji bo wan alîkariyên taybet têne pêşkêş dibin.

Pêşkêşiyên piştgiriyê ji bo mêran jî hene, yên bi xwe tund û tûjî kirine û dixwazin fêr bibin, çawa di gel mirovên din bi rêzgirtin serederiyê bikin an bê tund û tûjiyê serederiyê di gel kêşeyan bikin (beşê 4 Rêkên derketina ji tund û tûjiyê binêre)

ENCAMÊN BO ZAROKAN

Eger zarok bibin qurbaniyên tund û tûjiyê, encamên wan di gelek beşan de xwe nêzîkî yê li ba mezinan dike. Zarok jî şopa birînên laşî û yên giyanî, ji wan rûdanan bi xwe re hildigirin. Lê serederî bi wan re dikare ji hev ciyawaz be. Wisa hindek zarok gelekî bêdeng dibin û xwe ji komê vedikêşin, hinek zû bertekê nîşan didin û bêhinteng dibin. Dibe weha jî bibe, ku zarok nehêle lê diyar bibe, daku nebe derdek ji dê û bavan re.

Tişta alîkariya zarokan bike, ku li ser serpêhatiyên xwe ya tund û tûjiyê baxivin, ev alîkariyeke pir baş e di têkiliyên di gel dê û bavan de.

Tund û tûjiya nav dê û bavan de („tund û tûjiya nav malê") encamên xerab li zarokan jî dikin. Eger li zarokan bi xwe jî lêdan nekeve, sixêf neyên wan an destdirêjî li wan neyê kirin, tenê bi hevketin di navbera dê û bav de bibînin an bibhîzin an ne rasterast bibhîzin. Encamên giyanî gelekî zor in, mîna ku zarok bi xwe qurbanî be:

- Hestkirina bi netiştbûna (bêqîmetiya) xwe
- Poşmanî li dor qelsiyên aliyekî ji dê û bav, bihêzbûna bêgaviyê di rewşên jiyanê din de jî.
- Nerazîbûna ji xizmetên di dibistanê de
- Bergiriya di ber yê tewanbar de, ji ber hêza wî bi şaşî mîna ewlehiyê rast têne wergirtin.

- Wergirtina rola nimûneyan bo jin û mêran: Zarok, dema tûşî tund û tûjiyê dibin, Ew zarokên bûbûn qurbanên tundûtûjiya nav malê, bi xwe dibin tundrew di têkiliyên dereng de.
- Bargiraniya karsazê veşartî: Gelek caran dê û bavê li zarokan qedexe dikin, ku li dor tund û tûjiyê di navbera wan dibe, baxivin, ji ber yê tawanbar dikare li mehkemê were cezakirin. Ev bo zarokî guvaşeke mezin e, hest bi gunehî dikin û nikarin alîkariyê werbigirin.
- *Traumayên* zor: Ev tund û tûjiya gelemper dikare bibe sedema xwe vekişînê ji nav civakê, er girantir lê were, dikare bibe sedema xwekuştinê.

Zarok wek qurbaniyên tund û tûjiyê ji hêla dê û bavan ve

Ya herî zor, encamên wan li ser zarokan, eger tund û tûjî li nik dê û bavên wan an xizm û karên wan yên nêzîk bibe. Êdî baweriya zarokan bi mirovên din ziyan bi ser de tê, ji ber xwedê giravî ew mirovên ku diviya wî xwedî bikin û biparêzin, wa tund û tûjiyê lê kirine. Êdî mal nema hestê parastinê dide zarokî, lê dibe cihê xeman, ku zarok zehmetiyê dibîne, jê direve.

Gelek zarok dikevin rewşeke giyanî xerab de. Gelek ji wan nikarin beramber tund û tûjiya aliyekî ji dê û bavan rawestin, lê li nik xwe li kêmasî û gunehan digerin û kînê ji xwe digirin. Gelek zarok xwe li beramber tund û tûjiyê radigirin, daku malbat ji hev nekeve. An jî dikevin bin darê zora yekî ji dê û bavan, ku behsê tund û tûjiyê ji kesekî ji derve re nebêje.

Eger zarok demeke dirêj tûşî tund û tujiyê bibin, êdî dikare bibe sedema têkçûnên domdar di pêşketina kesayetiya wan de. Ev tê wê wateyê, ku kesayetiya wî di mezinbûnê de jî birîndar e, çiqasî tund û tujî ji zû ve nema be. Nexweşiyê derûnî mîna *„Borderline“* (nexweşiyek e, ku hest tevî hev dibin) an *„tirsa-berbestkirî ya têkçûna kesayetiyê“* dikarin encam bin.

Eger guman hebe, ku tund û tûjî ji hêla dê û bavan re li zarok bûye, hinga divê bi baldarî were berdewamkirinê, guvaş û tund û tûjiya dê û bavan lê kêmtir bikin. Guftûgoyeke şêwirmendiyê li navendeke şêwirmendiyê an li ser alîkariya bi telefonê (li kapîtelê 4, Rêkên derketina ji tund û tûjiyê binêre) dikare bibe alîkar, delîveyên alîkariyê, ew yên zarokan di rêya dguftûgoyê re baş biparêzin

2. Kengî mirov dikare bibêje ev tund û tûjî ye?

Hinek caran di gel ku encamên rabûna bi tund û tujiyê gelekî giran in ji malbatê an ji civakê têne pejirandin, nayên sezadan, an wek serederiyeke „normal“ tê pejirandin. Caran ev tişt di rêya adet û tîtalan de an di rêka zagonên welatî de têne xwestin jî û wek rêyeke yasayî tê hesibandin. Kengî tund û tûjî were qebûlkirin an pêdivî bibe, ji welatekî bo yên din, her weha ji civatekê bo ya din, ev girêdayî nirx û rê û resmên wan deveran in.

Zêdebarî wê ji hev cudabûna pejirandina tund û tûjiyê di bingehê de in di civatekê de bi forma civakê ve bend e. Li Elmaniya wek „Formeke civakî moderin“ rê li ber tund û tûjiyê tenê bi biryara dewletê bibe û tenê, dema çu rêyeke din nebe, ku rêgir be li ber tund û tûjiyê (li kapîtelê jêrê binêre „Desteseriya dewletê li ser tund û tûjiya li Elmaniya“). Di vê rewşê de, mirov behsa tund û tûjiyê nake, lê behsê destûrdana cihbicihkirinê an tevdîrên polîsan dike. Pêdiviye ew metirsiyê rakin û rê li ber sûcên sezadanê bigirin. Pêdivî ye polîs li Elmaniya li gor yasa çi bo wan nivîsî be tevdîrên serederiyê bigirin (Yasay polîs).

Di wan kewdanên din de, tund û tûjî sezadar e. Armanc ew e, di wê rêkê de berdewamiya tund û tûjî kêmtir lê were.

NIRX Û PÎVAN MÎNA TÊGEHIŞTINÊ BO TUND Û TÛJIYÊ

Di hindek herêm û welatan de mirovên tund û tûjiyê dikin û encamên giran bo qurbaniyan li dûv tên ji hêla malbat an jî civatê ve têne pejirandin. Ew wek karekî rûmetî û wek „normal“ tê dîtin û nayê sezadan. Carnan ev kar di rêka rê û resmên civakî di yasayên welatî de bin û wek karekî yasapêdan lê tête nêrîn.

Bo nimûne:

- Li hin welatan mafê mêran yê yasayî heye, ku çavdêriya biryarên aborî yên jinên xwe bikin. Tenê di bin mercên destnîşankirî de, dikare kar bike û pereyên xwe werbigire (> tund û tûjiya mewdanî).
- Adet û tîtalên kevneşopî li hin herêman wê yekê ferz dikin, ku hin parçe ji laşê keçikê bêne birîn, wate labiya û *zîlçik/ Klitoris*. Sinnetkirina jinan Tund û tûjî ye (> tund û tûjiya laşî ye).
- Di hin welatan de, zindankirina bi zulum û bê serûber heye, hinek ji wan tûşî bêqîmetkirinê, işkencekirinê an destdirêjîyiê ji hêla xizm û karn, polîsan an asayîşan û çi delîve û belge bo wan tune ku bibin ber dergehê dadgehê (> tund û tûjiya giyanî, laşî û cinsî).

- Di hin welatan de mafê mêr heye, li dema şêkirin bi fermî bibe, kîjan û her dema bixwaze cins di gel jina xwe bike. Çi derfet bo jinê tune ye, bibe hevpişkê biryarê, ku di wê kêlîkê de gêla wê heye karê cinsî bike an na. Karê cinsî dijî hez û daxwaza jinê pêk tê, ew dijî tund û tûjî ye, ku li Elmaniya dikeve bin navê seza de. (> Tund û tûjiya cinsî). Her weha wisa ye, dema herdû bi hev re ne zewicî jî bin.

Ji civatekê bo civateke din, carnan ji malbatekê bo malbateke din, ji hev cuda ye, ka kengî tund û tûjî tête pejirandin û kengî na. Ew bi resm, nirx û tîtalên kevneşopî ve bend in, bo nimûne bo wê hizrê ye, ka mêr an jin çawa serederiyê dikin û zarok çawa qîmetê mezinan digirin. Her wisa nêrîn û dîtina mirovan, ku di nirixandina mirovan de, dikarin şêweyên ciyaz hebin, her yek li gor girêdana mirovî ya regez an jî olî, ku rê li ber tund û tûjiyê vedike.

Ev nerixandinên civakê xwe bi demê re diguherînin, weke çawa şêweyê jiyanê, nirxên wê jî û kevneşopiya her civatekê bi demê re, ku xwe diguhere. Bi wê ve girêdayî jî, pêşdeçûna wan maf û yasayan yê welatekî ye.

Mafê zarokan di perwerdeyeke bê tund û tûjî heye

GUHERÎNA LI HEMBER TUND Û TÛJIYÊ

Beriya 50 salî, li Elmaniya mafê mamosteyê mêr û jin hebû, ku bi daran li şagirtên nêr û mê ji bo perwerdekirinê bidana. Ji sala 1973an ve li gor yasayê hatiye qedexekirin. Ji sala 2000 ve, li gor § 1631ê movika *pirtûka yasayê ya hevwelatiyê =Bürgerlichen Gesetzbuches (BGB)* mafê zarokan heye, ku perwerdekirineke bê tund û tûjî di malbatê de bibînin. Di dema nifşên dê û bav û taybet dapîr û bapîran de sezadana fîzîkî, ya laşî di nav malbatê de hîn karekî normal bû.

Zêdebarî wê, paralêl nirx di perwerdekirina zarokan de têne guhertin. Di dema nifşên bav û bapîran de ta, et û guncandin gelekî giring bû. Tund û tûjî weke sezayekî bo wan yên li gor rêmayan serederî nekirane û wek sedemekî dihate dîtin, daku zarok, fêrî yasa û rêmayan bibin. Birîndarkirina laşî û ya giyanî, kêm li ber çavan dihate danînê an jî bi cedî nedihat wergirtin.

Pêdiviye îro zarok parastî mezin bibin û bikari bin baş bi pêş bikevin. Di destpêkê de, ya giring neguncîna di gel daxwazên heyî ye, belê pêşdebirina kesayetiya xwe bi xwe ye. Ev dibe alîkar bi hizrên demokrat re. Zarok îro di yasayê de „Mafê ji bo alîkarî di pêşdeçûn û perewerdekirina ji bo rabûna bi barê berpirsiyariyê û kesayetiyeke civakî çalak heye". *(Pirtûka yasayî ya civakî,* Sozialgesetzbuch – SGB VIII § 1 Artikel 1).

Di gel ku guherîn di yasayan de hatiye kirinê, gelek caran hîn jî tê, ku Dê û bav bi tund û tûjiya fîzîk, laşî û giyan zarokan seza didin. Ev bo nimûne bi vî şêweyê dibe, şeqamek li peleguhê û riswakirin. Ev ji ber çi ye? Di perwerdekirina zarokan de berdewam asteng der dikevin an hin rewş hene, ku tê de sinor bo zarokan têne danîn. Wisa rewş dikarin stresê bo dê û bavan peyda bikin. Eger Dê û bav bi xwe, dema zaroktiyê di wisa rewş de lêdanê bixwe, êdî dikare weha bibe, ku ew bi xwe bikeve wisa rewşeke bi strês û nexwestî de û ew serederiya li gel wî hatî kirin, ew beramber zarokên xwe bi kar bîne.

Dibe ku te nimûneyek jî bo wê nebe, ka çawa mirov dikare serederiyê di gel rewşeke weha bike bêyî bi karanîna tund û tûjiyê. Dibe hun jî bixwazin bi nirxên kevin ve girêdayî bin, ji ber hun hizir dikin. „Evê ziyan li min jî nekir". Di biwarê perwerdekirina zarokan de bo wan kesan, yên bi rêzgirtin perwerdeyê bê bi karanîna tund û tûjiyê fêrbibin, kursên cuda û şêweyên alîkariyê hene (kapîtelê 4an. Rêkên derketina ji tund û tûjiyê, binerin)

! **Guherînên civakî yên pêdivî, daku Tund û tûjî kêmtir lê bihêt ew in, yên zorbeyî caran bo mirovan bi prosesa fêrbûnê ve bend in. Hinek caran tê xwestin, ku mirov amade be û guherînekê di nirx û nerînên xwe de çê bike.**

WATEYA NIRX Û KEVNEŞOPIYÊ LI PENABERTIYÊ ÇI YE?

Wek mirov em di zarokatiya xwe de ne tenê zimanê mirovan, yên derdorên me, belê, kî û çawa jî serederiyê dikin, bo nimûne mêr û jin, mirovên genc û yê pîr û kal, di cihên taybet de an yên giştî de. Tişta pê ve jî bend, kî tund û tûjiyê beramber yê din dikare bike. Ya herî bêhtir em di nav malbata xwe de fêr dibin. Ev fêrbûn, automatîkî pêk tê, bêyî ku em xwe pê biêşînin û bêyî ku em hest bikin. Têgeha pispor bo wê eve „Bicivakîbûn = Sozialisation"

Wek em çawa dikarin zimanê dayîka xwe bipeyivin, bêyî ku em rêmayên rêzimanî fêr bûbin, wisa jî em dikarin „Rastî" li welatê xwe ragirtinê fêr bibin, bêyî em fêrî rêmayên pêkvejiyanê bûbin.

Eger em xwe di welatekî din de bibînin, ne tenê divê em xwe fêrî zimanê wan bikin, belê her weha jî rêmayên pêkvejiyanê. Bo nimûne çawa ez ê silavê bidim kesekî din, ka çawa ez ê di wergirtina civanan de bo hevdîtinan di dema xwe de amade bim an tê çi wateyê, dema jineke biyanî bi min re bipeyive. Ez rêmayên pêkvejiyanê nas nakim, dibe netegehiştinek çêbibe an ne pejirandinek, bêyî ku were têgehiştin çima.

Dibe, ku ez serederiyeke bêrêz bikim, di gel ku dixwazim serederiyeke bi rêz bikim. Dibe ku bi wê serederiyê, ez yasayan binpê bikim, bêyî ku bizanim û bixwazim. Ji ber wê jî mana dema pêşî di welatekî biyanî de gelek caran demeke nexweş e. Lê ew delîvekê dide, ku ew ragirtina mirov, ya automatîkî li welatê xwe fêr bûyî, li ser hizrê bike û şêweyê ragirtinê yên nû fêr bibe û wan biceribîne.

Gelek ji wan dikare bi rêka çavdêrî û wek wê kirinê were fêrkirin. Ji bo piştgirî bibe, rêmayên pêkvejiyanê li Elmaniya nas bikin, zêdebarî wê pêşkêşiyên ciyawaz hene, bo nimûne kursên fêrbûna zimanî, kursa hevguncînê, agahiyên li ser malperên internetê an jî xizmetkariyên civakî di cihên manê de. Li dema nezelalbûnê an jî bi xwenebaweriyê delîve heye, pirsê bikin. Eger ew şêweyên serederiyê nehatin têgehiştin, gelek caran guftûgoyek sûdê dide, bo nimûne bi mirovan re, yên di wî welatî tên, lê eve demeke dirêje li Elmaniya dijîn, an di gel heval û hogirên elmanî ne.

Naskirina rêmayên pêkvejiyanê gaveke giring e, daku li welatekî rêya xwe ya rast bibînî. Di heman demê de pir gengaz e, ku hin rêma an şêweyên serederiyê hebin, di destpêkê de li mirov xweş neyên. Li vir gelekî giring e, ku mirov hizir bike an bipirse, ka wateya van serederiyan dikare çi bibe. Pir caran di wir de ew şêwe serederî dikare were têgehiştin û dikare were pejirandin.

Nirx û mafên civakî bi wê jî girêdayî ye, kî li hemberî kê dikare tund û tûjiyê bi kar bîne. wate, dibe dema şêweyek wek şêweyê rastteqîne pê hest were kirin, dibe jî, ku di rêka wê re li Elmaniya yasa bêne têperkirinê û gefa sizaya bête kirinê. Ji ber vê yekê giring e, ku yasa û mafên elmanî bêne naskirin, daku tişta nexwestî, bêhemd neyê têperkirin. Zêdebarî vê bi hêsanîtir, xwe û mirovên din biparêzin, dema mafê mirovî bi xwe naskirî bin.

Bo nimûne:
Dema mirov li dema axaftinê li çavê mirovê din nenere, dikare ev kar mîna nîşaneke bêrêziyê bermaber wî û wek necidiyetê jî were dîtin, di gel ku ew dikare mîna nîşanekê be ji bo dilnizmiyê.

Eger rêmayên civakî „şaş“ werin hestkirin, dikare ji wê be jî, ku pêşniyarên bi nirx yê welatê nû lê binecih bûyî ji yê xwe, yê jê fêr bûyî ne wek hev bin. Ew pêşniyar dikarin li dor wê bin, bo nimûne çi maf bo mêr, jin, zarok, dê û bav an jî kes û karên oleke destnîşankirî an neteweyek hene.

Bihtirîn caran em nizanin, ku me hin pêşniyarên bi nirx yên em fêr bûyî hene, ji ber em fêrî wan bûne, bê ku em pê hest bikin. Carnan jî em nizanin, ka me çi pêşniyarên bi nirx hene, ji ber ew bo me normal û bêguman diyar dibin. Eger em li welatekî din bijîn, ew êdî giring e, nirxên xwe yê taybet binasin, û yên welatê hun nû lê niştecih bûne jî. Gelek caran ew cudahiyên di nav nirxên welatê mirovî û yên welatê biyanî dihêle mirov hizir bike an dan û stendinê û guftûgoyê li dor bike.

BINGEHÊN YASAYÎ Û ZAGONÊN LI ELMANIYA

Mafên bingehîn li Elmaniya di *destûra bingehîn* de (artîkel 1 – 19) hatiye çesipandin. Bo nimûne mafên giring ev in

- Mafê jiyanê û selameta laşî (Artîkel 2, movik 2),
- yeksanî di navbera mêr û jinê de (Artîkel 3, movik 2),
- Parastina ji cudakariyê ji ber regez, neseb, ziman, welat û cihê jê hatî, bawerî, ol an nêrîna siyasî an seqetbûn (Artîkel 3, movik 3) û
- Mafê ji bo azadiya bîr û baweriyan, azadiya wijdanî û azadiya olî û rêzgirtina li azadiya pejirandina îdolojiyan (Artîkel 4, movik 1).

Destûra bingehîn bi tevayî mirov dikare di internêtê de, di bin www.bundestag.de/grundgesetz (bi elmanî) bibîne. Hun dikarin bo nimûne wergerandina destûra bingehîn bi van zimanan, çînî, erebî, farisî, ferensî, îtalî, polinî, rûsî, serbî, spanî û tukî li vir www.bamf.de/SharedDoc/Anlagen/DE/Publikationen/Broschueren/das-grundgesetz.html bibînin. Destûra bingehîn zêdebarî wê jî naveroka ji kursên pêkvejiyanê ye.

Di pirtûka sezayan (StGB) de tesbît bûye, çi serederî qedexe ne û çi tevdîrên sezayan li dadgehan dikarin bêne sezadanê.

Naveroka *pirtûka yasayê ya sezayan* serederiyên di derdorên taybet de jî, her weha di nav malbatê de an hevpişkan de, bo nimûne ji bo cinsî jî.

Ev peregraf wisa dibêje **„§ 177 êrîşên cinsî; tada cinsî; destdirêjiya cinsî (1) Her yekî li dijî iradeya mirovekî/e din serederiyeke cinsî bixwze bike an bike an daxwazê li wî/ê mirovî/ê bike an destûra cinsî jê wergirê di rêya mirovekî sisiyan re, wê bi şeş mehan- ta bigihe pênc salan were sezdanê“**

Rêmayên yasayî li ser jin û mêrê bi hev re zewicî jî dibin, ku wek prensîp, pêdiviye her du alî jî ji bo karê cinsî erê bikin, di hevjîniyê de jî. Di wir de, mêr û jin weke hev in. Mafê çi kesekî bo cinsî an serderiya cinsî tune ye bê vîna herduyan.

Nabe yê hevjîn an ya hevjîn têkevin bin guvaşan de. Di wê rêkê de mafê her yekî heye birayereke serbixwe bo laşê xwe bide û bi wê re tendurustiya laş û giyanê xwe biparêze.

Ji sala 2016an ve li Elmaniya jî acizkirina cinsî sezabar e. Bi wê ve girêdayî bo nimûne, maça bi zorê an hingavtina cihê cinsî hestebar ji laşî mîna singa an paşiyê, ku ev li dijî vîna mirovê/a têkildar be û „bi rêke cinsî bi xwe" bibe. (binere 184i StGb)

Ev li deverên giştî li dar dikevin bo nimûne li nav kolanan, lê li cihên kar jî dibin. Mirovên têkildar zor caran tûşî êrîşên ji nişka ve dibin. Mirovê tawanbar dixwaze diyar bike, ku desthilat û çavdêr li ser qurbanî heye.

Qurbanî zor caran vê rewşê mîna kêmkirin û pîskirinê dibîne.

Ji bo serederiya cinsî ya mezinan(Ji 18 salî bi jor de) bi zarok û gencan re (di bin 18 salî re) rêmayên yasay û yên din hene. Li vir ku genc an jî zarok erêniya xwe jî bide ew tawanbarî ye, bo nimûne

- Serederiya cinsî bi/di gel zarokên di bin 14 salî re berdewam sezadar e (176 StGB)
- serederiyên cinsî ji hêla mirovê guhpêdanê dike (bo nimûne xizim, mamoste) li ba gencên ta bi 16 salî berdewam sezabar e.
- serederiyên cinsî li/di gel gencê ta bi 18 salî seza ye, dema xizmeta xwe ji bo armanca serederiyeke cinsî bi kar bîne

Di van rewşan de li dor **„Bi karanîna cinsî ya xerab"** tê axaftin.

Ji bo zarok û gencan yasayên taybet hene, ev dikare kartêkirineke sivik ji mezinan hebe an tûşî guvaşa bibe ji ber sedema pêvegirêdanê. Zêdebarî wê pêdivî ye, ku zarok û genc pêşî fêr bibin, pêdivî û sinorên xwe di biwarê karê cinsî de binasin.

Ji bo zewacê di pirtûka yasaya sezayan de hatiye, ku zewaca bi zordariyê li Elmaniya qedexe ye. Wisa tê de hatiye
„§ 237 zewaca bi zordarî (1) Her kesê mirovekî ne bi yasayî bi tund û tûjî an di rêka guvaşan re bi hestiyareyeke xerab bi zewacê re bike, wê ji şeş mehan ta bigihe 5 salan were sezadan. Ev tawanbariya yasayî ew kiryar, eger bi karanîna tund û tûjiyê an gefxwarinên bi armanca xerabkirina navûdengê yê têkildar û pêkanîna merema xwe."

Her wisa di wî peregrafê 237de hatiye, ku her wisa jî sezadar e, mirovek li cihekî derveyî Elmaniya jî be ya/ê din mecbûrî zewacê bike û ev kiriyar hewldan jî be, kiryarên wisa curm in û kirdar tê sezadan.

Pirtûka yasaya sezadanê hemî di internêtê de mirov dikare, di bin www.gesetz-im-internet.de/stgb/index.html (bi Elmanî) bibîne, û li ser www.gesetze-im-internet.de/englisch_stgb/index.html (bi Engilîzî)

Afsaneyên li dor destdirêjiya li ser jinê

Ta îro jî hîn hukmên kevin bo vê mijarê hene. Hinek mêr û jin jî hene hinekî guneh dixin hustiyê wê jina ku tûşî serpêhatiya destdirêjiyê bûye. Pirê caran tê gotin, jinan serederiyeke şaş kirine an diviya bû li ber xwe bidaye. Gelekî giring e, were têgehiştinê, ku pirê caran jin ditirsin, dema destdirêjî li wan dibe û ji tirsan behetî dimînin. Dibe eger jin li ber xwe bide, ew tûşî metirsiyeke mezin bibe. Ji bo yasayê tenê peyva ku hêdî jî be „NA" têrê dike.

Çu carî jin ne gunehkar e, dema mêrek destdirêjiyê di gel bike! Serederiya wê berî an li dema destdirêjiyê çu rola wê tune li pirsa gunehkarî tune ye, wate bo nimûne çi cil li xwe kirine an ew bi şev bi tenê li ser rê ye. Yê/a tawanbar her dem gunehkar e!

Şaş e jî, ku berdewam tê gotin ku yê/a kirdar nenas e: di pirê caran de destdirêjî ji mirov û kesayetiyên nêzîk û derdora jinê ne, yên bi wî karî radibin.

Şaş e jî, eger jinek, mêrekî tawanbar bike, ku destdirêjî lê kiriye, bixwazê tola xwe jê hilîne an ziyanekê bigihîne wî.

Gunehkirina bi şaşî, li gor pêzanînên polîsan gelekî kêm in. Ji hemî buyeran rêjeya şaşiyê 3 % ye. Ya bêhtirîn ew e, ku gelek destdirêjî nayên tomarkirin, li gor 90 % ji giştiya buyeran e. Ev dibe, ji ber jin pirê caran ditirsin, ku ji wan neyê bawerkirin an jî ji şermê, li dor wan rûdanan nepeyivin.

Jêder: lêkolîna nûnerê wezareta ji bo malbatê, kalan, jin û gencan.
www.bmfsfj.de/blob/84328/0c83aab6e685eeddc01712109bcb02b0/langfassung-studie-frauenteil-eins-data.pdf

Pirtûkek din yasayî giring heye, ku tê de mafên hevwelatî û erkên wan yê giştî dest nîşan dike, ew jî pirtûka yasayî ya hevwelatiyan e (BGB). Tişta ev himbêz dike rêmayên din in ji bo peymanên kirînê, qerz, kirêya xaniyan û kirêdana wan an qoçanên milk. Di parçeyê 4an yê vê pirtûkê (BGB) jî maf û erkên malbatê destnîşankirî ne, mesele li vir li dora têkiliyên yasayî di navbera dê û bavan û zarokan de û her weha di navbera kes û karan de.

Wisa ye di pirtûka yasayî ya hevwelatî de bo nimûne wisa destnîşankiriye, çi şert û merc ji bo girêdanan zewacê pêdiviye hebin û di çi kewdanan ev peymana zewacê dikare tune bibe.

Ji heyva heftan sala 2017an ve, rêmaya yasayî, ku peymana zewacê tenê dikare bibe, ku herdû yên dixwazin bizewicin bi kêmanî 18 sal bin. Eger hinek rewş berê hebin ku ta dema zewicê bi kêmanî yek ji wan 18 salî bû, ji bo wan ev rêmayên xwarê hene:

Yek ji wan, yê ta dema girêdana peymana zewacê di bin 16 salan de be, bi şêweyekî automatîk ew zewac nayête pejirandin. Ji bo hevjînan, yên ku ji demeke dirêj ve zewicî ne, rêmayên demkî hene.

Eger peymaneke zewacê hebe, ku yek ji yên zewicî di wê dema girêdana peymanê de, temenê wî/ê, wê demê, di navbera 16 û 18 salan de bû, ev normal dê bi biryareke dadgehê rabe. Eger ew zewac batil bibe an na, dema ji bo hevjînan rewşeke taybet dikare çê bibe an ji bo mêrê zewicî an jina zewicî ku temen biçûktir ji yê yasayî ye, li vê dema dadgeh biryar werdigire temenê wan gehişti be temenê kamil êdî wê ew peymana girêdana zewacê were çesipandin.

Di § 1314an de movika 2 ji BGB hatiye çesipandin, ku zewaca bi zordariyê dikare tune bibe. Ji bo wê pêdiviye daxwazname di hundurê salekê de pêşkêş bibe (1317 movik 1 hevoka 1 ji BGB).

Pirtûka yasayî ya hevwelatiyê bi tevayî mirov dikare di internêtê de bibîne, di bin www.gesetz-im-internet.de/bgb/ (bi elmanî), û www.gesetziminternet.de/englisch_bgb/index.html (bi Engilîzî).

Tekstên yasayê ne her car bo têgehiştinê hêsan in. Eger pirsek hebe, an tiştek ne zelal be, dê alîkar be, ku pirs mirovê têkildar ji bow ê mijarê bibe, bo nimûne ji xizmetkarê civakî li kampa hunt ê de an li navendeke şêwirmendiyê (li kapîtelê 4an. Rêkên derketina ji tund û tûjiyê)

DESTESERIYA MONOPOLA DEWLETÊ LI SER TUND Û TÛJIYA LI ELMANIYA

Nîşanek e „moderin“ ya forma civakî ew e, di cudahiya ji forma civakî ya „kevneşop“, ew „monopola tund û tûjiyê ji hêla dewletê“ ve ye.

„Desteseriya dewletê li ser tund û tûjiya li Elmaniya“ ew berpirsiyar e, tund û tûjiyê tenê ji hêla dewletê ve bihêle û tenê ji bo rêgirtina li tund û tûjiyê an ji bo sezdana derveyî monopola tund û tûjiyê ya tê bi karanîn û dibe. Encama wê ew e, wê nîşana baweriyê derbasî nav civatê dike:

- Diyarkirina pêkvejiyana bê tûnd û tûjî,
- desteseriya dewletê li ser tund û tûjiya li Elmaniya wek institusiyonekê, ya delîveya pêvkvejiyana bê tund û tûjî cih bi cih dike (û cihê bi serneket, di rêya sezadanê re- vegerandina simbolîk ya tenahiyê) û
- ew hizra hevbeş, ku bi vî formê civakî kar dike, tê wateya li ser rêya paşerojê ye, ku delîveya berdewambûna tund û tûjiyê kêm e û pêdiviya wê kêm dike.

Li Elmaniya tenê rê bi tevdîrên dewletê dihête danê biryaran bi cih bînin, ew jî bi armanca, kêmkirina tund û jiyên zêde. Ev tevdîran e, mîna destkelemçekirinê, dermanê benckirinê, darê lêdanê û gulle ew jî li gor yasayê gelekî şidandî ye. Ev divê tenê destûr bête danê, dema bêne tehdîd kirin û ruh û jiyana wan bikeve nav metirsiyê de, ji bo xweparastinê dikarin bi kar bînin. Zêdebarî wê pêdivî ye tevdîr li gor serederî û rewşê werin muqayese kirin.

Ev jî tê wateya, ku tund û tûjî li ber yasayî tenê tê rastesipartina û ne ji ber serdemeke olî an „Oldarî an „kevneşopiyê“.

Di rewşa bikaranîna tund û tûjiyê ji hêla dê û bavan ve li zarokên xwe giring e *nivîsgeha gencan* bi biryara dewletê zarok biparêze. Pispor ji nivîsgeha gencan tên (wek karmendên berpirsiyar) ji bo binerin, ka zarok di nav malê de bi tendurustî mezin dibe an metirsî li ser heye, êdî Dê û bav mecbûr dibin, alîkariya bo perwerdekirinê werbigirin.

Di rewşên zor de ew erkdar, (wê) zarok bidin malbatekê ji bo xwedîkirinê an teslîmî saziyekê bikin. Di heman demê de alîkarî bi dê û bavan re jî dibe, da xwedîkirina bêyî tund û tûjî fêr bibin, daku zarok bikari be dubare vegere nav malbata xwe.

3. Çima Tund û tûjî heye?

Her mirovek dikare tûşî tund û tûjiyê bibe, yên penaber û jinên xwedî cih jî, zelam û zarok. Di heman demê de jî di bingehê de her mirovek dikare bikeve wê rewşê, ku tund û tûjiyê dijî beramberê xwe bi kar bîne, ku mercên destnîşankirî di wan çarçoveyan de bin. Ji bo em tê bigehin, ka çima tund û tûjî heye, giring e, li çarçoveya mercên civakê were dîtin.

Zêdebarî wê, sedemên bi karanîna tund û tûjiyê bi mirovî ve bend e, bo nimûne rewşên nexweş ku fişarên zor dikin an jî hinek nexweşiyên derûnî hene, di bin sedema bi karanîna tund û tûjiyê.

ÇARÇOVEYA MERCÊN CIVAKÎ – TUND Û TÛJÎ Û DESTHILAT

Çi forma tund û tûjiyê be, bila bibe, bi karanîna wê bi desthilatê ve bend e. Desthilat di têkiliyên mirovan bi hev re diyar dibe. Eger bo nimûne mirovek gelek pere, zanebûn an zanîn, hebûna bêhtir ji têkiliyên civakî, laşekî bi hêz diyar an cihekî bilind û bêhtir maf di civakê de heyî, êdî dikare di rêka wan sedeman re kartêkirinê li mirovên din bike û dibe sedema bi sinordarkirina pêkanîna zatê xwe.

Ew dikarin berjewendiyên xwe cih bi cih bikin û desthilatdariya xwe bi hêztir bikin. Ev berdewam bi tund û tûjiyê ve bend e, ji ber di wê rêkê re pêkanîna zatê mirovê din bi sinor dibe.

Tund û tûjiya struktûrî

Belavkirina desthilatê di civatekê de li gor hindek rêmayên destnîşankirî an jî struktûran dibe. Rêjeyên desthilatê ne wek hev in, wisa hin kom ji mirovan wê para wan kêm be, bo nimûne di wê rê re, ya ku neyê pêdan pê kar bike, da pereyan wernegire, û êdî nikari be biçe dibistanê û ji fêrbûnê bêpar be, êdî mirov dikare ji tund û tûjiya struktûrel baxive. Ev tund û tûjiya struktûrel newekheviyê pêk tîne. Zêdebarî wê, ew tund û tûjiyê li ser asteya rêxistin û malbatê pirtir dike.

Bo nimûne:
Eger civatek tenê rê bide mêran, ku kar bikin, lê jin di bin mercên gelek teng, destnîşankirî, êdî kêm digihe pera û ji ber wê desthilat bi şêweyekî nedad perwerî were parvekirin. Eger mêr tenê di malbatê de pereyan bîne, an jî dema mêr tenê alîkariya mewdanî ji dewletê werbigire, pirê caran dê desthilata wan li ser rewşa mewdanî be. Pere di destan de zor bi wate ye. Ew dihêle pêve girêdan ve peyda bibe.

Mêr dikare êdî xwedan biryar be, ka bi wan pereyan çi bike. Ew dikare bi wê rêkê jinê têxe bin guvaşê, ku hin tiştan bike, an rê lê bigire, ku hinek tiştên bo wê pêdivî bike.

Wateya tund û tûjiya strukturel tê, ku desthilat li ser asteya civakê wek hev nehatiye belavkirin. Endamek ji civatekê, weha bo nimûne jin û keç, mafên wan kêm e û derfetên xweparastinê jî kêm in, dema mafê wan binpê bibe. Di çu civakê de desthilat bi dadmendî nehatiye belavkirin, lê cudahiyeke mezin yê nedadmendiyê hene. Çendî ev cudahî mezin bin, wisa jî encamên Tund û tûjî di navbera mirovan de pirtir dibe.

Di bingehê de desthiladarî ne tiştekî neyênî ye, lê dikare bibe wateya hilgirtina berpirsiyariyê jî. Eger mirovek li ser yekî din desthilat hebe, pêdiviye bi berpirsiyarî serederiyê bike. Dê û bav hinekî desthilatdarî li ser zarokên xwe hene. Zarok bi wan ve girêdayî ne. Pêdiviye dê û bav vê desthilatê, di çarçoveya perwerdekirinê de, bi başî bi kar bînin, piştgiriyê bikin, bi armanca, ku ev wek mezin serbixwe bibin û bikari bin bêyî desthilatê ji derve ve jiyana xwe endeze bikin. Li vir giring e, wek dê û bav berev daxwazên zarokan ve biçin, serederiyê di gel wan mîna mezinan, serbixwe binêrin û di biryardanê de, nêrîna wan li ber çav were girtin, tişta bi wan ve bend hay jê hebin. Gereke desthilat wisa li dê û bavan neke, ku tişta di serê wan de cih bi cih bikin an daxwazên xwe li ser hesabê yên zarokan pêk bînin. Serederiya bi berpirsiyane ew e jî serf û radana pereyên ji bo jiyanê bibin, li vir jî pêdiviye daxwazên zarokan li ber çavan werine danîn.

Tund û tûjiya sazbendî

Di hundurê navendan an peymangehan de rêmayên taybet hene, yên ferz dikin, kî çi maf heye. Û li vir jî newekhevî di desthilatê de heye, ku bi rêya wan rêmayan hatiye danîn, bo nimûne di navbera xwendevan û mamosteyan de, di navbera karsazan û karkerên wan an di navbera rêveberiya kampan û mirovên di wan kampan de dijîn.

Ev rêma dikarin bibin rêgir, mirov tiştekî bike, ku ew bi xwe bi giringî dideyne, bo nimûne xwarina xwe amade bike. Bi wê pêkanîna kesayetiya wî sinordar dibe. Li vir jî axaftin li ser tund û tûjiya sazbendî ye. Desthilata yê/ya kamendê kampê nabe bi şaşî ji bo berjewendiyên kesayetî ji xwe re bi kar bîne.

ÇI HIZIR DIKARE TUND Û TÛJIYÊ REWA BIKE?

Mirovên tekane dikarin têkiliyên-desthilatê di nav civatê de, di nav dezgehan an di nav malbatê de, bo nimûne di navbera zayendan de an regezên cuda cuda de, bo xwe bi kar bînin û serederiya xwe ya di gel tund û tûjiyê wek karekî rewa li qelem bidin, eger ew ne ew civat jî be, belê tenê xizmeta berjewendiyên kesayetî bike, Ew rewabûna tund û tûjiya xwe dibînîn bi wê, ku di prensîp de, meyla hêzê be, tund û tûjiyê bikar bînin.

Pirê caran nêrîna desthilatê li ser şirovekirina layîq ji nivîsên olî re an di rêya îdolojiyên ciyawaz de mîna yasayên rast û neguhêrbar bin, radiweste. Çarçoveya îdolojiyên tundrew têgînên wan kesên xudan nîşanên bilind, ew pêdiviye desthilatdariyê bikin, biryaran werbigirin û destûrdayî bin desthilatê mîna tund û tûjiyê bikar bînin, belê mecbûr bin, û mirovên nirxnizimtir, ew yên bêne „parastin", „bêne vegerandin bo fêrbûnê" „çavdêrîkirin", veger, „veguhestin" şer dike an mecbûr e were tunekirin.

Cudahiya di navbera nirxên bilind û nirxên-kêm li gor îdolojiyê ye bo nimûne bi sedema zayend, weha di navbera mêr û jinan de, bi sedema endametiya wî di olekê de an bi sedema rengê çermê wî an endametiya regezekî biryar tê wergirtin. Ev avakirin bi xwe berelayî ye, her mirovek bi serê xwe taybetmend e û gelek xisletên ciyawaz di hundurê xwe digihîne hev. Cudahîkirina mirovan di nav civakê de wek komên mirovên bi nirx û yên bê nirx tenê xizmeta wê hin dê diket ew jî rewakirin û bi kar anîna hêz û tund û tujiyê ye.

Çêkirina hêzeke bi terazû

Ev tund û tûjiya îdolojî ji kesê qurbanî re pirê caran kêm delîveyan dihêle ku mirov li dijî tiştekî bike, ji beryên bi hêz di civakê demaf û yasayan li gor berjewendiyên xwe datînin. Ta radeyekê yê qurbanî jî wan hizrên îdolojî hildigire, ku ew tund û tûjiya lê hatibe kirin yasayî ye, dema hun li deverekê di gel wisa îdolojî mezin bûbin, û li ber xwe nadin. Di wê rêkê re sîstema tund û tûjiyê berdewam û bi hêz dibe.

Ji bo guhertina sîstemekî wisa û avakirina sîstemekî beramber bi rêzgirtin û mirovahî ji ber wê çendê dê giring be, ku mirov, yê xwe di cihê biryardanê û hêzê de dibîne, ji bo bi karanîn hêza bi terazû, li ser asteya civakî, lê berî her tiştî jî li navbera-asteyên mirovahî di malbatê de pêk were. Sîstemekî wisa berê rêzgirtin û mirovahiyê nabe berev windakirina delîveyan, yên nûnertiya berjewendiyên kesayetî bibe, yên nûnertiya berjewendiyên xwe dikin, belê delîveyên baş, ku berjewendiyên hemiyan di rêka dan û stendinê de bi kari be pêk bîne û di wê rêyê de malbatê û civatê bi hêz bike.

Ew tundû tûjiya, berê xwe bide dijayetiya parçeyekî ji civatê, saziyekê an malbatekê, û armanca wê ne kêmkirina tund û tûjiyê be, berdewanm û ji bo dema dirêj wê tadeyeke mezin li civakê, saziyan an jî malbatê bike. Lêkolînên zanistî diyar dikin, ku girêdanek li ser asteya civakî di navbera çarçoveya bi karanîna tund û tûjiyê û belengaziya aborî de heye. Tund û tûjî li ser asteya malbatê û encamên wê di kapîtela yekê 1 de hatiye şirovekirin. Ji bo têkilî-yên di nav malbatê de, tê wateya ku bi hêzê û çewisandinê hatiye destnîşankirinê. Rêzgirtin, hezkirin û piştgirî dikare tenê li dar bikeve, ku her dû alî pê ve berbend bin.

TUND Û TÛJIYA KULTÛRÎ Û OLÎ

Tund û tûjî dikare xwe di rêka rêmayên tesbîtkirî yê serederiyan û qedexekirinê nîşan bide, ew yên xwe di kevneşopiyê, nirxên kultûrî û olî heq dikin. Di civakên petriyarîkî de, ew civakên yên mêr serdest e li hemberî jinê, rêmayên gelekî tund bi taybetî li dijî jinê hene. Bo nimûne, ji jinê re diyar dikin, ka çi û çawa cilan li ber xwe bike, xwe binuxumîne, ka biçe kî deverê an çi têkiliyên ci-vakî dikare girêde û çi na. Zêdebarî wê jî ew rêma rêgir in bo nimûne, ku ew bikari be xwe ji tund û tûjiya mêr biparêze.

Eger ev rêma û qedexekirin li ber çav neyêne danê, wisa kevneşopî dixwaze, nirxên kultûrî an ol dê daxwaza sezadanê bikin. Ev dikare, dûrkirina wî ji civakê, qedexekirina derketina ji malê, ji binpêkirinê ta bi kuştinê be. Ev tawan bêhtirê caran ji hêla malbatê ve dihête bi karanîn. Nimûneyek ji wan ew ya jê re tê gotin „mirina ji bo şerefê", ew ya li gor agahiyên UN salê bêhtir ji 5.000 jin li seranserî vê dunyayê dibine qurbana wê.

Acizkirina cinsî di gelek rewşên rojane de pêk tê

Hemî mirov beramber yasayê wek hev in. Mafê jin û zarokan weke yê mêran heye û dikarin bi xwe biryara xwe bidin. Yasa û ol ji hev cuda ne.

Ev tawanbarî xizmeta wê hindê nake bibe rê-gir li ber tund û tujiyê bêhtir, lê ev di rêka tundrewiyê re bi cih bibe, ku pêvioye rema bêne cihbichkirinê. Di civakên petir-yarkî de, netenê rêma bo jinê gelekî aloz in, lê sezadan jî li dema guh-nedana rêmayan hinga kartêkirin li jinê bi hêztir dibe.

Di eynî- demê de, di rêka van rêmayan de zoreke civakî, sezdaneke cibich dibe û tund û tûjî bi kar tê. Ew mirov nexwaze vê sezadanê cih bi cih, êdî heye ew bi xwe were sezadan, an bi kêmanî nirxê wî di nav civatê de nemîne û kesek pê re nede û nestîne.

Delîve li Elmaniya heye, xwe biparêze, dema bi sedma wisa guvaşên civakî tehdîdek metirsîdar hebe. Pêzanîn li dor delîveyên parastinê û alîkariyê di tengaviyê de hun dikarin ji nik navendên şêwirmendiyê an ji nik polîsan wer bigirin. (> Kapîtel 4: Rêkên derketina ji tund û tûjiyê)

KULTÛRA TUND Û TÛJIYÊ

Li welat û herêmên, ku mirov tê de gelek salan an jî mecbûr e bi dehê salan şer û şerê nav xwe tehemul bike, tund û tûjî weke parçeyekî „normal“ di jiyana rojane de tête dîtin.
Êdî zarok di „kultûra tund û tûjiyê“ de mezin dibin, wê tund û tûjiyê bi xwe re wek rêbazeke normal hilgirin, daku aloziyan bo rêma û berjewendiyan cih bi cih bikin. Rêbaza bê tund û tûjî ji bo çareserkirina aloziyan, bo nimûne di rêka dan û stendinê an navbeynbûnê, pêdiviye dubare were fêrkirin.

SEDEMÊN DERÛNÎ JI BO HELWEST A TUND Û TÛJIYÊ

Bi awireke li taqe mirovan dikare bargiraniya derûnî an jî nexweşiyên derûnî sedemek ji sedemên hêrişbazî an ji bo serderiyeke tund û tujiyane be.

Bargiraniyên derûnî dikarin bi sedema serbûriyên demên buhurî çêbû bin, bo nimûne tûşîbûna tund û tûjiyê bi xwe an serpêhatiya rewşeke metirsîdar li ser jiyana wî di cengê de, zulum an jî rev û derbederî. Ev dikarin tevlîheviya-xewê, ser-an zikêşî an bêhintengî û şerbazî çê bikin. Pirê caran ev dibin sedema bikaranîna alkoholê an şêweyên din ji stendina dermanên hişbiriyê jî.

Bargiraniyeke aktuel ya din jî bi ser de tê, bo nimûne bi sedema welêt demeke dirêj ji bendewariyê an neewlehî ji ber prosesa penabertiyê, bersiva neyênî li dor penaberîdanê, tirsa ji vegerandinê, ne erêkirina hatina malbatê, tirsa li ser malbatê yên li welêt, kêşeyên di kampan de an serpêhatiyên nijadperestiyê û nepejirandina wan bi giştî, ev pirê caran tê wateyaku strêseke yekcar zor çê bibe, ku di encamê de dikare bibe sedema windakirina kontrola li ser xwe û bi karanîna tund û tûjiyeke nexwestî de. Ev forma tund û tûjiyê li gor serhijmêran gelekî kêm e, lê dikare wek yeke yeke çê bibin.

Di van rewşên zor de gelek caran dikare alîkar be, dema mirov bikari be bi mirovekî din re pêbawer bipeyve. Karmendên civakî jî di kampan de an navendên şêwirmendiyê (Li adrêsên têkiliyan binêre) demê ji bo axaftinê pêşniyaz dikin, da bikari bin bêhinfirehiyekê peyda bikin.

Nexweşiyên derûnî

Hinek nexweşiyên derûnî yê destnîşankirî jî, dikare bibe sedema, ku kesek bibe mêldar, di têkiliyên nav mirovan de tund û tujiyê bi kar bîne.

Ev tevlîheviya derûnî diyardeyên bi hêz in û bi şêweyekî taybet taybetmendî an dîmenên kesayetî destnîşan dikin, wate bo nimûne şêweyê hizirkirinê, hestkirinê, têgehiştina derdorê û rêkxistina wê an serederiyê di gel mirovên din. Ev taybetmendiya kesayetiyên berê mirovên têkildar bi xwe an jî mirovên di gel wan dide kêşeyan. Babet li vir nexweşî ye, tê wateya, ku mirovê têkildar ne bi daxwaza wî, hizra wî, hestên wî an bertekiya wî dikare hilpere an were guhertin.

Gelek nexweşiyên cuda yên derûnî hene. Nîşanên wan nexweşiyan û symptomên wan di bin navê ICD-10 („International Statistical Classification of Diseases and Related Health Problems“ Zelaliya serhijmêriya navntewî ji bo nexweşî û kêşeyên tendurustiyê) hatiye danîn.

Di nav van nexweşiyên rengereng yên derûnî, du form û dûrvên, ku ji wan re tê gotin „Têkçûna kesayetiyê“ hene, yên metirsiyeke zêde ji wan heye, dikarin tund û tûjiyekê di gel xwe bînin. Ev di pileya yekê de „tevlîheviyên -kesayetiya necihgirtî di hêla atîfî de“ ne.
Ew mirovên têkildar, yên zehmetiyan bi sedema têkçûnên kesayetî dikişînin, bertekiyê li ser vê rewşa heyî di têkiliyên nav mirovan de, mîna bo nimûne alozî, bişûndevegerandin an poşmanî an derbirîna ji hêvîkirinê, gelekî bi hestiyarî didin.

Ew gelekî bi lez hest dikin, ku hêrişî wan dibe an têkçûyî û di hundurê xwe lerze bû. Ew sedem e, ku pirê caran bertekiyê ji bo wan rewşan bi guhnehbariyan, engirîneke bê kontrol û hêrişbazî li yê beramber xwe, an bê qîmetdîtina xwe jî û xwe vekişan dide. Hestên wî yên taybet bi giştî dikevin bin kontrolê, guhêrbar û cihbicih nabin, ev ji bo avakirina têkiliyên berdewam û dan û stendinê bi mirovan re astengî ne. Tengaviya hundurîn dikare wisa bi hêz bikeve, ku yê têkildar xwe bi xwe birîndar bike, daku êdî bi sivikbûnekê hest bike. Ev nexweşî dikare weha lê bike, ku yê têkildar li ser hizir bike, ku êdî dawiyê li jiyana xwe bîne, an jî heme xwe bikuje.

Ya diwan, girêdayî bi tund û tûjiyê ve formeke bi wateya têkdana kesayetiyê ye, wek „antî civakî ya têkçûna kesayetiyê“ bi nav bibe. Nîşana vê nexweşiyê ev e, ku yê têkildar berê xwe bide silûkekî hêrişbaz



Her yek di kare bi erkê xwe rabe, ku di gel hev bê tund û tûjî be

û tund û tujiyê, ji ber wê jî, ew berjewendiyên xwe tînin pêş û encamên serderiya wan di gel yên din, ne di xema wan de ye an. Ew mirovên din ji bo berjewendiyên xwe bi kar tînin. Zor caran yê têkildar wek tawanbar diyar dibe, ji ber ew xemê li yasayan û rêmayên civakî, çi be bila bibe, naxwe. Di kesayetiya wî de, yê têkildar pirê caran zû diazire û bi zexim.

Têkçûneke derûnî din ew e, yên dikarin tund û tûjiyê bikin û piştgiriyê bidinê, „Pädophilie= Bi karanîna cins di gel biçûkan" li qelem dide. Ev „Pädophilie" mîna „têkçûneke cinsî" di pejirandinê de tête hesêbê. Yên têkildar hest dikin yê meyldarê karê cinsî di gel zarokan (beriya sinêltiyê) bêne kişandin. Tê wê wateyê, ku ew ihtiyaceke karê cinsî yekcar zor di gel zarokan heye. Ev li Elmaniya di bingehê de bi yasa qedexe ye, ji bo parastina zarokan (li bingehên yasayî binere). Wateya wê bo têkildaran, ku ew pêdiviyên cinsî yên xwe nikarin pêk bînin. Di hinek rewşan de yên têkildar nikarin pêdiviyên xwe yên cinsî kontrol bikin an zeft bikin û ew dibe sedema tun û tûjiya cinsî di gel zarokan.

Nexweşiyê derûnî dikarin di rêka terapiyeke derûnî re (li kapîtel 4. Rêkên derketina ji tund û tujiyê) û hinek tevdîrên din tîmar bibin. Di rewşeke weke ya „Pädophil" de ta niho çu delîve bo saxlembûn û rehetbûna tune, lê terapiyeke derûnî bi taybetî zor giring e, daku hêrişên cinsî li ser zarokan kêmtir lê bikin û rêkên din bibînin, çawa di gel vê têkçûnê bijî.

ENCAMÊN BO TAWANBARAN-MIROVÊN; TUND Û TÛJIYÊ BI KAR TÎNIN; NEXWEŞÎ YE?

Nexweşeyeke derûnî dikare di hinek caran de ne tenê sedemek bo tund û tûjiyê be, lê encam jî be ji hêla yê tund û tûjiyê dike.

Ev dikare li ba leşkeran an jî wan rêkxistinên terorîstî, yên bi armanc rahêne li ser tund û tûjiyê kirine, ku di hundurê wan de keşeyên derûnî peyda bûne, dema ew neheqiya xwe bizane. Ew dikare bargiraniyeke hestane ji guneh û şermîniyê peyda bibe, ew dikare bibe nexweşiyeke derûnî jî, bo nimûne, ku dikarin bêne veguhestin bo trauma „Jan" an jî depresiyon „xemnakî"

Eger tund û tûjî ji hêla endamên malbatê ve bibe, bêhtirê caran, di rêya bavan an jî kuran re tête kirinê, weke serrastkirinekê ji bo birîndarkirina rêmayên kultûrî û olî, êdî bawer dikin ku ev kar rewa ye, ji bo „parastin e" bawerî û zagonan e ji hestkirina bi gunehan û ji nexweşiyên derûnî. Lê di vê rewşê de jî pêzanînên li dor neheqiyê dikarin berev encamê derûnî giran biçin.

4. Rêkên derketina ji tund û tûjiyê

EZ DIKARIM ÇI LI DIJÎ TUND Û TÛJIYÊ BIKIM?

Rêzgirtinê nîşan bidin

Her mirovek mafê wî heye, ku jiyana xwe bê tund û tûjî bi rê ve bibe. Daku tund û tûjî di nav hevpişkan û malbatan de kêmtir bibe, ew giring e, bi çavekî rexneyî, li serederiyên xwe hizir bike.

Girêdayî bi hevpişkiyê çend pirsên bên dikarin alîkariyê bikin:

Ez weke mêr hevpişka xwe asteng dikim? Hin xal hene, ku ez di wan de mafê wê kêmtir ji yê xwe didimê? Hinek rewş hene, ku ez xeberên nebaş bibêjim hevpişka xwe, lê didim an bi şêweyekî ji şêweyan beramber wê tund û tûjiyê bi kar tînim? Min cins bi hevpişka xwe re, bê ku ew bixwaze kiriye? Eger belê, çima ez dikim? Ez pêdivî çi me an dikarim çi bikim, daku beramber wê serederiyeke bi rêzgirtin û bê tund û tûjî bikim?

Girêdayî bi serederiya di gel zarokên xwe hinek pirs giring in bo nimûne:

Rêzê li mafên zarokên xwe yê perwerdekirina bê tund û tûjî digirim? Çawa dikarim serederiyê di gel rewşên aloz bikim, ez biryarê digirim û cih bi cih dikim an amade me, li gor daxwaz û pêdiviyên zarokên xwe bipejirînim? Hin rewş hene, bo nimûne, ku ez li zarokên xwe bidim, xeberê nexweş bêjim wan an wan seza bidim? Eger belê, çima wisa dikim? Ez pêdivî çi me an dikarim çi bikim, daku bi rêzgirtin serederiyê di gel zarokên xwe bikim?

Ji bo bikari bî şêweyê serederiya xwe biguhrî, hin pêşkêşiyên pispor yên alîkariyê hene, dikarin sûndmend bin (Li jêr binere).

Daxwaza rêzgirtinê bikin

Tund û tûjî, wek di kapîtel yê 2 û 3 de hatiye şirovekirin girêdayî ye û bi wan nirxên di nav kom û civakê de jiyan dibin û bi rêzgirtin serederî di gel wan dibe û her weha bi rêjeya hêzê ve bend e. Ev rê didin, ku tund û tûjî li dijî zarok û jinan were bi karanîn. Ev tê wateya, ku li vê derê jî kar divê bo kêmtir lêkirina tund û tûjiyê.

Ez çi dikarim weke mirovekî wate weke zelamekî bi tena xwe bikim? Karekî mezin e, eger serederiyê di gel hevpişka xwe bê tund û tûjî û bi yeksanî bikim. Eve dibe nimûneyeke berçav î baş ji bo zarokên we û ji bo derdora we ya civakî jî. Ev ihtîmala metirsî û gumanê li dor tiştên çê dibin, dema mêr dest ji rola xwe „weke malxwê malê" berde, dibe bi şaşî were têgehiştin û dûrtir biçe ji ku biryareke mêr wergirtiye û cihê wî bête girtin. Zêdebarî wê jî ev karekî kartêker e, xwe di derdora civakî de, wek nimûne di nav malbatê de, di nav hevalan de, li cihê kar, di kampê de, ji bo serederiyeke bê tund û tûjî û bi rêzgirtin bermaber jin û zarokên xwe bi kar bîne.

Nimûne:
Eger kesek di axaftinê de bi sivikahî an bêrêzî li ser jinan xwe der bibire, pêdiviye mirov li ser bêdeng nemîne. Pêdiviye zelal û bi nav bibe, ku hun bi xwe bi rêzgirtin li vê babetê dinerin û nirxekî mezin didin wê serederiyê û ew derbirînên wisa bê nirx tevlî nabim.

Eger çavdêrî li rewşekê bibe, ku mêrek serederiyê di gel jinê bi bêrêz bike an wê bêqîmet bike, êdî giring, ku mirov bêdeng beramber nemîne. Pêdiviye mirov li ser helwesta wî ya bê rêz di wê rewşê de wî agahdar bike û hişyar bike û jê bixwaze bi rêzgirtin serederiyê bike.

LI KÛ ALÎKARIYÊ WERDIGIRIM?

Alîkariya di tengaviyê de

Di rewşeke lezgîn ya tund û tûjiyê de, dikare telefona polîsa numera 110 bê-pere were kirin. Polîs erkdar e, di cihê cih de were, ji bo parastina mirovê têkildar. Di serederiyeke sezadar de mecbûr e polîs hinga gilî hilde.

Li dema tund û tûjiya nav malê pêdiviye polîs mirovê tund û tûjî kirî heta bi 14 rojan malê lê qedexe bike. Yê polîs dikare mirovê tund û tûjî kirî ji bo demekê wî bigire li ba xwe, da ku dûrkirina wî ji malê cih bi cih bike.

Polîs li Elmaniya erkdar e beramber monopola tund û tûjiyê ya dewletê. Polîsên jin û mêr tenê destûrdayî ne tund û tûjiyê bi kar bînin, bo nimûne kesekî ku hewce bike ji bo parastina mirovên din, an parastina wî bixwe, wî bi zorê û li gor yasayê bigirin. Nabe polîsa/ê serederiyê bi tundrewî bike. Her formek ji biçûkirinê an jî işkenceyê li dema lêpirsînê an jî di zindanê de, di bingeha xwe de qedexe ye.

Di hinek rewşên tund û tûjiyê de, bo nimûne dema yê tawanker nêzîkî yê qurbanî be an eger girêdaneke xizaneke di nav wan hebe, yê qurbanî li destpêkê (yekencar) naxwaze berê xwe bide polîsan û naxwaze gilî jî bike, an jî ne bawer e. Birayar wergirtin li dor, aya an kengî pêdiviye gilî were kirinê, tenê bi biryara qurbanî ve girêdayî ye. An yê tawanker, eger ew bi xwe gilî, li ba polîsan li xwe hilde, daku di demeke bi pêş de xwe ji giliyekî sezadanê biparêze û ihtîmala ku sezaya wî bigihe radeya herî nizim û kêm.

DELÎVEYÊN ŞÊWIRMENDIYÊ

Negirêdayî bi hildana *giliyê sezakariyê* an Çalakirina polîsan delîveyên Cuda cuda Yên şêwirmendiyê hene.

Şêwirmendî, tê wateya, ku di gel karmendekê/î pispor, bo nimûne sozialpêdagogekî/ê an pisporekê/î di warê derûnnasiyê de, li dor rewşa xwe di gel wî baxive û pêk ve li delîveyan bo başkirinê were geriyan. Di guftûgoyên şêwirmendiyê de nedana hukmekî li ser geriyana li kesekî alîkar an serederiya wî/ê û ne li ser lêpirsînê, belê kesê alîkar wê were wergirtin û rêz lê bê girtin, weke pêwîst. Ew jî biryarê dide, ka di vê guftûgoyê de dixwaze li ser çi babetê bide û bistîne û çi na. Biryarwergirtina, ka di pey şêwirmendiyê re wê çawa di gel rewşê serederî bibe, ev tenê biryara wî mirovê dixwaze alîkariyê bike.

Yê şêwirmend an ya şêwirmend dikeve bin barê razveşartinê de, tê wateya ku ew (jin û mêr), nabe tişta hatî axaftin, ji hin din re were gotin. Awarteya razveşartinê ew e, ku yê an ya şêwirmend bigihe wê baweriyê, ku jiyana zarokî di metirsîyê de ye an metirsiyeke lezgîn heye li ser jiyana wî mirovê hatiye alîkariyê bixwaze an metirsî li ser mirovek din heye. Eger hun li vir bi guman bin, pirsê hîn beriya hun guftûgoyê destpê bikin, bikin, ka di çi rewşê de razveşartin nabe.

Ji bo qurbaniyên tund û tûjiyê her weha bo tund û tûjîkaran li elmaniya, her yek li dor herêm û cihê niştecihbûnê, xizmetên cuda cuda pispor yê şêwirmendiyê hene, bo nimûne nivîsgeha şêwirmendiyê an

! Para bêhtir ji xizmetên şêwirmendiyê bêpere ne. Gelek xizmeta wergerandinê jî pêşkêş dikin

jî delîveyên şêwirmendiyê bi telefonê (adrêsên têkiliyan binere). Ev pêşniyazên şêwirmendiyê dikarin bêne bi karanîn jî, ew yên metirsiya tund û tûjiyê heye an di bin guvaş û fişaran de ne, ku tund û tûjiyê bi kar bînin, bo nimûne, ji bo şerefa malbatê pakij bikin. Heval û xizm û kar jî dikarin şêwran werbigirin, ka çawa dikarin alîkariya mirovekî bikin, yê tund û tûjî lê dibe an ew bi xwe tund û tûjiyê bi kar tîne.

Hinek xizmetên şêwirmendiyê alîkariyên taybet bo jinan an taybet bo zelaman pêşkêş dikin. Li vir zor xizmetên şêwirmendiyê ji bo jinan hene, ji ber ew li Elmaniya pirê caran û bi hêz tuşî tund û tûjiyê dibin.

Ji bo aloziyên di nav hevpişkan de an jî di nav malbatê de, xizmetên şêwirmendiyê hene, ku her dû alî pêk ve an hemî endamên malbatê dikarin beşdariyê tê de bikin (li adresên têkiliyan binere).

Eger hun di kampê de „Xaniyekî hevbeş de“ dijîn, ew dikarin ji we re li wergervanekî guncayî bigerin an jî xizmetkarên civakî li wir dikarin alîkar bin, li dema civandananê bo şêwirmendiyê.

TERAPIYA DERÛNÎ

Li dema nexweşiyên derûnî an birîndarkirina giyanî, an li nik yê çend nîşan mîna fişarê, bêxewî, bêhintengî, gumankirin an azar, ew yê ne bi sedemên laşî ne, *terapiya derûnî* dikare alîkar be

Li dema terapiya derûnî dermankirin bi şêwyê axaftina di gel terapeutê an terapeuta derûnî an bi bijîkê/bijîjka derûn î de. Carnan hin rahêne dibin an hin core rahêne wek erkê „wezîfeyên" malê têne danê. Ev terapiya derûnî dikare ta bi 2 salan berdewam bike.

Di dan û stendineke terapiya derûnî de, hinek pirs li mirovê tê xwe terapî dike têne pirsîn. Ev ne ji bo tenê pirsiyaryan bikin, belê ji bo rewşa wî baş tê bigehin û bikari bin corê êşa wî nas bikin. Tenê wisa dikare gav bi gav dermankirineke guncayî bi pêş de biçe. Eger mirov ne bi temamî bawer jî be, ka bi rastî nexweşiyeke derûnî heye, lê rûniştin û axaftina pêşîn ji bo zelalkirinê bi cedî were wergirtinê

Terapeutê an terapeuta derûnî û bijîjika an bijîjkê derûnî, her wisa yê an ya wergêr jî dikevin bin barê razveşartinê.

Di hinek cihê mana hevbeş de wate di kampan de karê terapiya derûnî rasterast li wir tête pêşkêşkirin, Ev li gor her herêmekê ye ko dikarin xizmetên taybet yê terapiya derûnî bo penaberan (li cihê adrêsên têkiliyan binere) pêşkêş bikin û baş e bi cedî were wergirtin, li vir dikare bi heftiyan û rojan bikeve, ta ku cihekî ji terapiyê re were dîtin. Karmendê civakî di cihê mana hevbeş de an navenda şêwirmendiyê de, li geryana li terapiya derûnî û ravekirina wê, kî wê mesrefa wê bi xwe bigire, dikarin alîkariyê bikin.

Nimûneyek bo xêzên pan ji bo daxwaza terapiya derûnî ji bo penaberan dikare ji internetê li ser vê navnîşanê were xwestin: www.baff-zentren.org/wp-content/uploads/2017/03/BAfF_ Arbeitshilfe_Therapiebeantragung.pdf

KURS JI BO PERWERDEKIRINA BÊY TUND Û TÛJÎ

Di gelek deveran de hinek kurs têne pêşniyarkirin, ka çawa zarok bê tund û tûjî dikarin perwerde bibin. Li vir pêzanîn ji bo pêşdeçûn û pêdiviyên zarokan têne dan, ji bo bertekiyên guncayî di rewşên aloz de û ji bo delîveyên, ka çi serederiyê di gel kêşeyan bike. Di eynî demê de derfet heye, ku mirov pêzanînan di gel malbatên din alûgor bike.

Di vê kursê de û beşek jê jî taybet e ji bo malbatên ku serbûriyên wan yên penabertî hene têne pêşkêş-kirin (li adrêsên têkiliyan binere).

Ferhengoka têgehan

Bêbeşkirin/Deprivation	Rewşa kêmbûna tiştan an têvedanê, yên ji bo pêkanîna pêdiviyên xwe yên giring.
Bijîjkê derûnî/Bijîjka derûnî	Bijîjkê pispor/bijîjka pispor (bijîjk bi fêrbûneke zanistî pêşdetir) bo nojdariyên êşnasînê, dermankirinê û lêkolînê ji têkçûnên derûnî, terapiya derûnî pêşkêş dike û dikare dermanan binivîse
Borderline (= Atifiya-têkçûna kesayetiya ya livok)	Nexweşiyeke giyanî ye, ya ku kartêkirinê li kesayetiyê dike. Yê nexweş bi lezgînî û bi şêweyekî zor rewşa wî xerab dibe û serederiyeke bê ser û ber dike. Ew nakokiyên wan hene, ku têkiliyên hevgirtî bi mirovan re ava bikin û her dem hest dikin, ku ji hundur ve vala ye.
Civakî	Koma mirovan yên pêk ve di bin têkiliyên siyasî, aborî û civakî de dijîn
Civak	Têkiliyên mirovahî yên mirovekî di nav civatê de an bi jîngeha wî ve girêdayî
Derûnî/Psyche	Ev jiyana hestewerî, hizirkirin û rabûn û rûniştina mirovekî ye
Fîzîkî	Tişta bi laşî ve girêdayî
Gilî/Giliyê sezakariyê	Pêagahkirina polîsan an dozger bi karekî sezadar, bi armanca, ku ev kar were sezadan û di pey re were qerebokirinê. Giliyekî cinayetî dikare ji her mirovekî were bilindkirin, yê ku bi karekî wisa sezabar agahdar bûye. Ev gilî bêpere ye. Dema gilîkirinê êdî yê karmend mecbûr in, pirsiyariyê lê bikin û wî karê sezabar zelal bikin.
Milîs/Miliz	Hêzên şer, yên di rêya meşq û rahênana demeke kurt de amade dibin an di rewşên pêdivî de bi kar tên
Navendên şêwirmendiyê	Ew navendên mebestên cuda cuda hene û ji bo aloziyên giran alîkarî û piştgiriyan pêşkêş dikin. Şêwirmendî dikare bi guftûgoyeke kesayetî rabe û hinek jê bi telefon an di rêya E.mailê an jî Chatê re dikare pêk were.

Nivîsgeha gencan/ Jugendamt	Parçeyek ji hukumeta herêmî, erkên bingehîn in ji bo pêşkêşkirina şêwirmendî û piştgiriya yasayî ji dê û bavan û yê mafê perwerdekirinê heye, alîkarî bo perwerdeyê û ewlehîkirina parastina zarok û gencan, li gor çarçoveya mercên yasayî.
Pirtûka destûra welatvaniyê/Bürgerliches Gesetzbuch (BGB)	Di vê pirtûkê de yasayên giştî yên mafên taybet hene, weha têkiliyên yasayî di nav kesên pirîvat de, li Elmaniya. Di gel wê naveroka mafê malbatê di gel erêkirinên yasayî bo girêdana zewacê û-berdanê û mafê xwedankirinê „perwerdeyê". Ev hemî pirtûka destûra welatvaniyê mirov dikare di internêtê de bibîne, di bin vê navnîşanê de www.gesetze-im-internet.de/bgb/ (bi elmanî), und unter www.gesetze-im-internet.de/englisch_bgb/index.html (bi engilîzî).
Pirtûka yasa civakî/ Sozialgesetzbuch (SGB)	Ev li Elmaniya mafên civakî yê dibin, karê alîkarî û piştgiriyê birêk dixe, daku bikari bin jiyaneke mirovayetî bi rûmet bi rê ve bibin, dema ku hêz mirovî bi xwe têrê neke, bo nimûne di çarçoveya alîkariya zarok-û gencan de, pêşvebirina kar an alîkariya civakî de, bi xwe ve digire
Pirtûka yasa sezadanê (StGB)/Strafgesetzbuch (StGB)	Ev li Elmaniya pişkên sûnc yên tên îdiakirin û encamnên wan î yasayî bi xwe ve digire. Ev pirtûka yasaya sezadanê bi tevayî dikare di internetê de, di bin vê rûpelê de were dîtin www.gesetze-im-internet.de/stgb/index.html (bi elmanî), und unter www.gesetze-im-internet.de/englisch_stgb/index.html (bi engilîzî)
Pîvan/Norm	Di nav komekê an civata ku hêviya serdest, çawa mirov di rewşên destnîşankirî de serederiyê bike
Qelsbûn/Dysfunktion	Têkçûna erkan
Razveşartin „Sirveşartin"	Erkê yasayî yên grûpên pîşeyî yên cuda cuda ew e, pêzanînan nedin kesê siyan.
Terapeutê (Tîmarker) derûnî/Terapeuta derûnî	Yê/ya bijîjk, yê/ya derûnas an yê/ya pedegog di gel beşekî pispor di fêrbûna pêşdetir de, yên terapeutên derûnas pêşkêş dikin
Terapiya derûnî	Dermankirina ji nexweşiyên derûnî li ser bingeha zaniyariyên zanista derûnî û pêregehiştin, bêhtir di forma dîdaran de
Tirsa-xwedûrkirina ji têkçûna kesayetiyê	Nexweşiyeke giyanî ye, nîşankirî ye di rêka hestiyariyeke bêsinor beramber şûndevegerandin û nepejirandinê bi rêya hin din re, herweha di rêka nakokiyên hundurîn re, ku hêviyeke bi hêz ji bo nêzîkahiya navbera mirovan de bi sedema tirsa mezin ji nepejirandinê

Trauma	Birîneke giyanî kûr e ji encama serpêhatiya buyereke metirsîdar î tund, ku mirovek nikari be serdestî wê bibe û ji ber wilo demeke dirêj bi nexweşiya derûnî dikeve
Xemnakî/Depression	Nexweşiya giyanî, ku nîşana wê, bi taybetî bi domdirêjî xemgînî, xemsarî, hestên gunehbariyê û hinek xwepesinandinê, xewa nerehet, çavlixewî û nedilbêjiya xwarinê ne. Yên têkildar, zehmetiyê dibînin, ku kar bikin, fêr bibin an bi xweşî roja xwe bibhurînin.
Destûra bingehîn/ Grundgesetz (GG)	Destûra bingehîn ya komara Elmaniya federal, hemî sîstemên dewletî-û nirxên biryaran di nav xwe de dihilîne û di ser wan hemî normên yasayî yên elmanî ne. Ev hemî destûra bingehîn ya Elmaniya dikare di Internetê de were dîtin, di bin www.bundestag.de/ grundgesetz (bi elmanî). Wergera vê destûrê bi çînî, erebî, engilîzî, ferensî, îtalî, farisî, polnî, serbî, spanî û turkî heye û hun dikarin bo nimûne li vir bibînin www.bamf.de/SharedDocs/Anlagen/DE/ Publikationen/Broschueren/dasgrundgesetz.html
Zilçik/Klitoris	Parçeyek ji regezên jinê yê cinsî ye, ji bo xweşiya cinsî giringiya wê heye

Têbînî

Adrêsên têkiliyan yê bijarte

Beratung für Männer gegen Gewalt
Tieckstraße 41
10115 Berlin
Tel.: 030 785 982 5
www.volkssolidaritaet.de/berliner-volkssolidaritaet/beratung-hilfe/beratung-fuer-maenner-gegen-gewalt/

Şêrwirmendiya ji bo mêran dijî tund û tûjiyê
Navenda têkiliya destpêkê û şêwirmendî bo kesên tund û tûjiyî kirine. Wergirtina têkiliyên telefonî bo axaftinên tekane bi derûnzanan re. Karkirina li ser serederiya bê tund û tûjiyê û karê grûpan pêşîlêgirtinê.

Berliner Zentrum für Gewaltprävention (BZfG) e. V.
Hohenzollernring 106
13585 Berlin

Navenda Berlin ji bo pêşîlêgirtina tund û tûjiyê
Navenda bo bersivdana stratîjiyên-serederiyên alternatîv ser fêrkirina tund û tûjiyê. Pêşniyar ji bo kursên bi kom, rahênan, bertekiyên koman her weha karkirina li ser rewşên aloz yên taybet.

Männernetzwerk Dresden e. V.
Schwepnitzer Straße 10
01097 Dresden
Tel.: 0351 810 434 3
www.escape-dresden.de

Toreya kar î mêran li Dresden
Navendeke bixwegir ya azad bo genc- û karê zelaman. Navenda ji bo alîkariya genkan, Pêşkêşiyên şêwirmendî-û rahênanê di rewşên tund û tûjiya nav malbatê û karê-antî- Tund û tûjî berev yê kirdar.

Fachstelle für Gewaltprävention
Herdentorsteinweg 37
28195 Bremen
Tel.: 0421 794 256 7
www.fgp-bremen.de

Navenda pispor ji bo pêşîlêgirtina tund û tûjiyê
Navenda-parastina qurbaniyan, alîkariyê pêşkêşî yê tawanbar û yên bi karê tund û tûjiya fîzîkî û cinsî rabûne. Ev şêrwirmendî di rêka Internetê re jî tê pêşkêşkirin.

Hamburger Gewaltschutz-Zentrum
Altonaer Straße 65
20357 Hamburg
Tel.: 040 280 039 50
www.hamburgergewaltschutzzentrum.de

Navenda Hamburg- bo
Navenda şêwirmendiyê bo mirovên bi xwe, xwe qeyd dikin û yên ji hêla dadgehê, an cihên din ve hatine rêkirin.

Jedermann e. V.
Lutherstraße 15 – 17
68169 Mannheim
Tel.: 0621 410 73 72
www.jeder-mann.de

Jedermann e. V.
Navendeke pispor bo pêşîlêgirtina tund û tûjiyê û destwerdanê. Şêwirmendî û terapî ji bo zilamên ji mehkemê hatine rêkirin, rêhanan li dijî tund û tûjiyê û destwerdan li dema rûdanên tund û tûjiyê.

Männerbüro Hannover e. V.
Ilse-Ter-Meer-Weg 7
30449 Hannover
Tel.: 0511 123 589 10
www.maennerbüro-hannover.de

Nivîsgeha mêran Hannover
Navendek bêsûdmendî ye, ya xwe bi rewşa jiyanê ya gencan, gencên mêr û zilaman her weha xwe bi derora wan ya civakî ve mijûl dike û di xizmeta daxwaziyên wan de ye. Karê şêwirmendiya qurbanî û tawanbaran dike.

Münchner Informationszentrum für Männer (MIM)
Feldmochinger Straße 6
80992 München
Tel.: 089 543 955 6
www.maennerzentrum.de

Navenda Münch ya pêzanînan bo mêran
Navenda şêwirmendiyê û destpêşkeriya alîkariya xwe bi xwe bo zilaman. Pêşkêşiyên bo alîkariya bi xwe û serpêhatiyên bi xwe – yên komên mêran bi armanca pêşdebirina pzîtîv ya hişmendiyê li ba mêran.

Projekt STOP-Training
Neue Kasseler Straße 3
35037 Marburg
Tel.: 06421 307 807 4
www.juko-marburg.de

Projektê STOP- yê rahênanê
Navendeke bê sûdmendî bo xizmeta civakî ya erênî- û pêşkêşiyên gencan- û alîkarî di dema hebûna pirsgirêkan de.

Sozialberatung Stuttgart e. V. – Fachstelle Gewaltprävention
Charlottenstraße 42
70182 Stuttgart
Tel.: 0711 945 585 310

Navenda pispor taybet bi pêşîlêgirtina li tund û tûjiyê
Cihê têkiliya bo pêzanînên li ser, şêwirmendiyê û tevdîrên rahênanê ji bo mijarên tundûtûjiya nav malbatê, ya kolanê û tund û tûjiya gencan.

Verein Kinder- und Jugendhilfe e. V. TAET HG
Mainzer Landstraße 625
65933 Frankfurt
Tel.: 069 384 729
www.vkjh-frankfurt.de

Komela alîkariya zarok û gencan TAET HG
Saziya ji bo hawarhatina alîkariya gencan- tevdîrên ji bo genc û mezinên hatine sizadanê.

Parastin û ewlehî ji ber tund û tûjiyê

Rehber bo yên koçber û zilamên penaber yê nû

Di vê rehberê de, pêzanîn li dor babeta parastina ji tund û tûjiyê li elmaniyê himbêz dike û bo mêrên koçber û penaberên nû li Elmaniya hatiye danîn. Li vir em dixwazin derbasî babetên fereh bibin. Em pêzanînan li dor mafên we, cureyên alîkariyê û zagonên parstina ji tund û tûjiyê pêşkêş dikin.

- Sedem, şêwe und encamên tund û tûjiyê
- Kî parastinê ji tund û tûjiyê dike – û çawa?
- Guherîn di nêrînê de li hember tund û tûjiyê
- Rêkên ji tund û tûjiyê diçin
- Adrêsên ji yên alîkariyê bo têkildaran û xizmên wan pêşkêş dikin

Ev rehber di çarçoveya projektê „MiMi-pêşîlêgirtina tund û tûjiyê di gel penaberan ji bo penaberan", seranserî Elmaniya bi pêş ket.
„www.mimi-gegen-gewalt.de" û „www.mimi-bestellportal.de".

Ev rehber tê dan ji hêla: